Abbas Ismaîl

# Nameyek Ji Gorê

(çîrokin ji dîrokê)

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

Ez vê pirtûkê diyarî D.p. Kendal
dikim digel rêz û silavan

**Abbas Ismaîl**

LIV.KL.4986
23/11/2017
914 ISM NAM

Institut Kurde de Paris

# *Nameyek ji gorê*

## *(Çîrokin ji dîrokê)*

Nameyek ji gorê
Abbas Ismaîl
Kompyûter: Fewaz Ebdê
Çapa yekemîn 2012
Hejmar: 500

Institut kurde de Paris

## Diyarî

*Ez vê pirtûkê diyarî partîzan û siyasetmedarên Kurd dikim*

*Ez bi hêvî me ku her yek du caran bixwîne, ji bo ku baş – baş dost û dijminên xwe nas bikin û rêbazên xebata xwe li gor fen û fûtên wan biguherin.*

**Abbas**

**Qamişlo 12.12.2011**

Institut kurde de Paris

## *Pêşgotinek*

Bi xwendina van "çîrokan"re, du hest bi min re peyde bûn; yek jê kêfxweşî bû, ku mamoste Abbsa pala xwe daye dîrokê, û çîroka xwe li ser ava kiriye, û di vir de girêdana wî ya xurt û hezkirî, bi dîroka miletê wî \me yê Kurd ve xweş diyar dibe. Bi hûrbînî li dîrokê vegeriyaye, û pirr tiştin balkêş jê hilbijartine, weke pisporekî jêhatî û pêkhatî di girekî kevnar de kar bike, vepixêre, û bi nermayî bikole, da ku ziyanê negihîne wan şûnmayên nirxdar, û hêdî hêdî tozê ji ser bide alî, çi di dîroka kevn de û çi di ya nû de. Yê din ew bû ku M. Abbas carna xwe jibîr kiriye ku çîrokê dinivîse, û rast daye ser pişta bûyera dîrokî, gelekî bi ferehî daye ser, û ketiye nav hûrik mûrikin ku di hûnana çîrokê de pêwîstî huqasî bi wan tune.

Di çîroka "Nameyek ji gorê" de, mînakek



Institut kurde de Paris

pir spehî ber çav dike, ramanin nû, afirandeneke serbixwe peyde kiriye; ji ber rewşa aloz a miletê Kurd, û nepijirandina "miletên misilman" jê re, miletê Kurd neçar dibe ku hawara xwe bighîne lehengekî misilmanî kurdî navdar, ew jî Selahiddînê Eyyûbî ye, ku karibin dengê xwe bighînin kongirê misilmanan ê ku li Tehranê hatiye girêdan, û ji ber ku Selahiddîn li wê cîhanê ye û ti kes ji wê cîhanê venegeriyaye, radibe nameyekê ji kongir re dinivîse, dixwaze rastiyê bi tevayî û rastiya miletê xwe, bi taybetî, ji wan re berçav bike, xerabî û ziyanên ku ji bin serê wan gihane vî miletî, li ber wan radixîne. Ne tenê wiha, lê belê ji wan re dibêje: Hûn ditirsin ku Kurd careke din xurt bibin, û Qudsê vegerînin, û sendelên we ji bin we bikişînin, û we bê rûmet bikin!

Serbûriya "Bazareke siyasî" gelek ji wan kesayetiyên Ereb anîn bîra min, û ew guftûgoyên ku carê di navbera me de dibûn,

çaxê ku digotin: Ma hûn Kurd çi dixwazin? Vaye em û hûn weke hevin. Em tev eynî zorê bi hev re dikêşin, eynî xweşiyê bi hev re dijîn!". Çaxê ji wan re dihat gotin: «Hema vaye hûn bi zimanê xwe dipeyivin, û yê me dibistanek tenha jî bi zimanê me nîne!», digotin: "Vaye em û hûn di eynî dibistanê de û bi eynî ziman dixwînin bavo!!!". Lê çaxê «Yabo, ka werin, hûn dest ji zimanê Erebî berdin, û emê jî dest ji yê Kurdî, û emê bi hev re bi zimanekî din bixwînin û binivîsin, û bila ew bibe zimanê dewletê.» dibihîstin, devê wan bi husteke vedibû, û peyva "Hêêê!" bi hezar seyrnîşanî re, ji devê wan dişemitî!

Tiştekî din, xweş û balkêş, M. Abbas, berçav dike; ew jî taybetmendiyeke zimanê Kurdî ye. Çaxê ku serokê Sûrî Fewzî Silo, bi du şalyaran re "Elî Bozo, û Rişdî Kîxya" – hersê jî Kurd bûn- diçin Misrê û serokwezîrê Misrê pirsa wateya "Silo" dike. Fewzî lê vedigerîne û dibêje: «Kurd navê Silêman biçûk û şêrîn dikin, bilêv dikin û dibêjin Silo».

Institut kurde de Paris

Bê goman, M. Abbas di vî berhemî de, hin qurçik ronî dike, dixwaze yê xwendevan, bi xwe re, li nav pelên dîroka xwe bigerîne, êş û azarên miletê xwe berçav bike, ziyanên ku ji dilpakiya wî gihanê diyar bike, da ku ev milet karibe ji nû ve wê dîrokê bixwîne, sûdê jê bigre, dost û dijminan ji hev nasbike, û xwe ji nû ve ava bike.

***Fewaz Ebdê***

Qamişlo

21.11.2011

Institut kurde de Paris

# *Nameyek ji gorê*

Roja Sêşemê 8/12/1997 li bajarê Tehranê kongira islamî li darket, pêncî û pênc dewletên misilmanan beşdarî di vî kongirî de kirin, lê mixabin dewletek kurdan tunebû ji bo ku şandê wê amade bibe, her weha şêxeki kurd yan mele û zanyarekî beşdarî di vî kongirî de nekiribû, da ku êş û derdên kurdên sêwiyên misilmanan, ji wan rengmisilmanan re bibêjin, û daxwaza wan şirove bikin. Mixabin û sed mixabin, dabaşa Kurd –weke miletekî misilman- nehate zimên, lê dabaşa kurdên Ustiralya, Cawa, Bosna û Nîcîrya kete nav gengeşê, dewletên misilmanan piştgirî û alîkariya xwe ji wan re berçav kirin. Ma wê kî deng û basên Kurdan bêje; Fars yan Ereb yan Tirk? Ewan diziya gelê Kurd kirine, gencîn û qada wan li hev parkirine.

Kî xwediyê vî miletê reben û bindestê Islamê heye? Ev miletê ku oldarî û sofîtiyê

Institut kurde de Paris

ew kor kiriye, ev misilmanên dagirkerên qada kurdan nahêlin dewleteke kurdî, mîrnişîneke kurdî çêbibe. Ditirsin Kurd careke din herin Qudsê aza bikin, sendelên bin serokên misilmanan bişikînin.

Di roja pêşî de ji civata kongirê Kurd ên zindî û yên mirî bi van fen û xapên dijminên Kurdan hay bûn, Kurd ên zindî nikarîbûn tevgerekê bikin, qedexe bû ku şandekî bişînin kongirê, û heger zanyarekî wan, bi dizî, derbasî kongir bibûya wê li vegerê -bi destê misilmanan- bihata kuştin. Rabû ji neçarî Kurd ên mirî û binax li hev civiyan û şandek amade kirin ji bo herin Sultanê islamê Selahiddîn şiyar bikin, wî ji xewa şêrîn rakin. Şandê wan jî ev bûn:

1) Îsayê Hekarî: Qehreman û lehengê destê rastê yê Selahiddîn, kujyarê sedan ji bubaegîdên Xaçparêzan.
2) Cerdîk: Cansivik û canda, mêrxasê roja giran.
3) Kamil Elmeştûb: Yê ku zilamek bi şûrekî dikire du parçe, û di rûniştinekê de berxek dixwar.
4) Qereqoş: Dadyarê hêja û berdevkê Selahiddîn.



Institut kurde de Paris

5) Elfadil: Xwendekar û qelemdarê Selahiddîn, kaxez û xame jî pê re hilanîn.

Ev kesên pesindar di dîroka Selahiddîn û şerê xaçparêzan de, li hev civiyan, her pêncsed pêşmergên Kurd ên canfîda (hêza taybet) hêzên Şehrezûrê û Amedê, hêza Hekar û Cezîrê, hêza Tawûsî ya Şingalê, hemû bi xwe re birin û çûn bajarê Şamê, li derdora gora Selahiddîn (Yûsiv kurê Eyûb "Necmuddîn" kurê Şadî kurê Merwan ê Rewadî ji bajarê Dewînê yê li Ezerbîcan) rawestiyan. Hemû ketin temenê, serî xûz kirin, giriyan. Her pênc payedaran gora wî dorpêç kirin, hemiyan bi yek dengî, bi yek qêrînê bang kirin Selahiddin, piştî heştsed salî ew ji xew rakirin, gelek gilî û gazin jê kirin, xwendekar û dadyar Fadil pêşkêş kirin, ji Sultanê ola islamê xwestin ji rizgar kirê Qudsa pîroz xwestin– ku nameyekê binivîse û ji kongira islamê re bişîne, ji wan bixwaze ji ser pişta vî gelê reben dakevin.. bese.. bese.

Neçare, Selahiddîn rabû û ji dadyarê xwe; nivîskarê xwe ElFadil xwest û jê re got: binivîse!

*Nameya Selahiddîn*



Institut kurde de Paris

Gelî rengmisilmanan! Gelî gewdezindî û dilmiriyan! Gelî beşdarên civata mezin – kongira rengmisilmanan ne ya islamê Gelî zanistên malperest ne olperest! Gelî şêxên cibe fereh û şaşik berz Divê hûn xweş û baş zanibin, hûnê vegerin ber destê Xweda, yan we Xweda jibîr kiriye? Eve bextê we? Evin armanc û nerînên we? Kîjan islamê ev ji we re gotiye? Hûn kîjan şerîetê dixwînin û we pêkaniye? Diyare we islamek li gor nijad û berjewendiyên xwe çêkiriye?! Kîjan pêxemberî, kîjan Xwedayî, ji we re gotiye ku kuştina neviyên min, kuramêd min cihade? Kîjan pirtûka islamê ji we re gotiye Kurd Şeytanê mezinin?!

Gelî rûniştvanên civatê Ez dibînim hûn hemû nijadperestin ne olperestin. Çawa hûn pismamên min; Kurdên dilsoz, bi kîmyayê û xerdelê disojin?! Wan bi hezaran koçber dikin, û zindî wan binax dikin, Gund û bajarên wan wêran dikin,Hûn vî gelê evîndarê islamê diqelînin, hûn welatê wan, qada wan, dagir dikin, Hûn qesr û qûnaxan tê de avadikin û wan diterqînin; koçeber dikin! Gunehê wan çiye? Lê diyare ku gunehê wan, xebat û kiryarên min in! Heger

Institut kurde de Paris

min Impiratoriyeke Kurdî damezrandiba, niha hûnê kole û navmaliyên gelê Kurd bana. Ez lêbûrînê ji gelê xwe dixwazim, û mixabin û sed mixabin, ku min ezmûna Ebû Mislimê Xurasanî –Iskenderê duwemne xwendibû, û reva Selmanê Farisî ji nav ereban piştî mirina pêxember jibîr kiribû!

Gelî kongirgêran! Hûn ne yekîtiya islamê û hevgirtina misilmanan dixwazin. Hûn azadiya misilmanên Maw-maw û Çînê û Nîcîrya dixwazin, û armanc û daxwaz we ewe ku hûn misilmanên rebenî bê hêz, ên di navkoma we de biqelînin û winda û tune bikin! Hûn qada wan li hev par bikin! Bi taybetî, hûn raserî miletê Kurd hatine. Diyare hûn dixwazin tola qiral û mîrekên xaçperestan ji wan hilînin, Ew lehengên weke melek Xî û mîrekê serhişk û Şêr Elpirins Arnolt, û qiralê navdar serokhêz Rîçard Dilê Şêr.. hûn dixwazin tola wan û bi hezaran weke wan, ji neviyên min hilînin, û xwîna wan ji gelê min bistînin! Ya baş ewe – gelî kongirgêran– hûn bên û min ji gorê derxin, hinek petrola Kerkûkê bi min dakin û min bişewitînin. Ez gunehkarim, ezim Selahiddîn, ezim Yûsiv kurê Eyûb kurê

Şadî, ji êla Rewadî.. ez gunehkarim. Ez dixwazim Kurd li min bibûrin.

Ey serokên misilmanan, Eve xebata we ji wan xortên çavşîn re? Ewên ku ji serê çiyayên Hekar, Ararat û Şingalê daketin, xwe kirin bendav hemberî leşker û hêzên heft dewletên Ewropî rawestiyan û nehiştin ku herin Mekke û Medînê bistînin û dagir bikin! Eve diyariya we ji wan mêrxas û dilhesinên ku bi sedan hêzên leşkerên bi çek û top vegerandin, Qudsa pîroz aza kirin?

Gelî kongirgêran, Li dîrokê vegerin, bixwînin.. ew çaxa şerê me Kurdan û Xaçperestan di himmehim û guryanê de bû, bapîrên hinekan ji we xinizî ji Xaçperestan re dikirin! Bi sedan xortên hêja, serokleşkerên islamê di riya mala Xwedê de hatin kuştin.. lê hûn şerm dikin û newêrin wan bûyeran bixwînin, newêrin wî dîmenî bînin ber çavên xwe.

Ey kongirgêrên kongira misilmanan! Hûn dixwazin herdem Kurd bimînin çavşikestî, bimînin şêx û mele û sofî; doza xwe, mafê miletê xwe nexwazin, herdem Kurd bimînin kole û mizgeftan bimalin, bimînin bê



Institut kurde de Paris

xwendin, bimînin di zindanan de bê hêz û bê keyan, ji ber ku hûn ditirsin Kurd xurt û aza bibin careke din herin Qudsê ji destê Cihûyan aza bikin, vêca hûnê bê rûmet bibin û bê sendel bimînin.

Gelî rengmisilmanên kongirê, Ezê di vê nameyê de çend bûyeran ji we re bêjim dibe hûn bi xwe hay bibin, hiş û ramanên we tev bi xurcilin, bi lebitin û hûn dilkovan bibin, bi hestin zelal li Kurdan meyze bikin.

- Dema Xaçparêzan E`kka dagir kirin deh hezar leşkerên me Kurdan tev li lîder û serokhêzên me tê de dîl bûn, û min jî E`kka dorpêçkir -Ez Selahiddînê Kurdî- û şer berdewam kir, bi sedan Kurdên dilsozê islamê pakrewan ketin û wê çaxê min gelek histir barandin, û bi saya Xwedê û lehengên Kurd min keleha E`kka vekir. Divê hûn zanibin, û hûn zanin lê ji gotina rast bazdidin, hûn xwe kerr dikin.. me ew şer ji bo rizgarkirina misilmanan dikir, ji bo xurtbûn û serketina islamê me dikir, ne ji bo ku em Kurdistanekê li

Institut kurde de Paris

E`kka û Qudsê ava bikin!

- Di şerê azakirina Qudsê de gelek xort û mîrekên Kurdan xwe canfida kirin, xwe dixistin devê top û cebilxanên xaçperestan ta me Qudsa pîroz ji we xinizan aza kir. We bi saya me dewlet ava kirin û em di nav lingên hespên xwe de hiştin.
- Gelî misilmanên kongira Tehranê! Bînin bîra xwe, çend caran we misilmanan xwestin min bikujin! Fen û vîlikên Sawir mîrê Misrê bînin bîra xwe. Êrîşa kujyar û xinizên şêx Sînan ji bo kuştina min bînin bîra xwe! Li Misrê û li Helebê ez du caran birîn kirim.lê ez ji desthilanîn neketim, min daxwaz û armanca xwe bire serî, min ola Islamê biserxist, min Islam kire yek, min ereb kirin yek ma kî ji we dikare xebatek wisa bike.
- Gelî zanyarên kongirê! Bi hişekî zelal û dilekî paqij li dîrokê vegerin. Ma ne min ola islamê parast. Min ew ji çalê derxist? Heger ne ji mêraniya min baya, heger me xaçparêz ji ser pişta islamê venegerandina, wê anuha ev kongirê we tune ba, wê ne ev navên we bana.. ê ku navê wî Mihemmed e, wê anuha Exnatyos,

Institut kurde de Paris

yan Corc, yan Henna ba!

- Şah û Qiralên Elmanya, Ingeltra, Frensa û Nemsa şandek ji min re dişandin û digotin: Yûsiv (Ûsivko) ji ser me vegere, Here welatê xwe ava bike. Here Kurdistanê çêke; ji Helebê ta Dewînê, ta Tebrîzê hemû ji te re. Digotin: Emê devê gencînê zêr û zîv ji tere vekin. Lê min – weke we– Filestîn nefirot. Min qada islamê bi dest wan ve berneda.

Gelî nûnerên kongira islamê li Tehranê! Guhên xwe vekin kin û çavên xwe bel kin, vê kîn û zikreşiyê ji dilê xwe bavêjin. Ez ji we re dibêjim:

Gelek qehremanên weke min di zikê diya Kurd de hene, wê rojek bê ku hûn pir poşman bibin, şîreta min bînin bîra xwe; wê roja Kurdan derkeve û Kurd xurt bibin, vêca hûnê xwe di kîjan qulikê de veşêrin? Ez bi hêvî me hûn li xwe vegerin, û bi rûmet li Kurdan bi nerin.

Institut kurde de Paris

## *Bazareke siyasî*

Ez dibêjim: Rêwîtî û gerr dibistan e; hiş û ramanên mirov paqij û geş dike, û heger ew kesê di jiyanê de rûniştî ye bi qalûçka ezmûneyan û serpêhatiyan diçine, yê gerrok bi dasê û tapanê diçine.

Beriya çend salan bi şûnde –weke hercarmin xwest ez bayekî ji ber serê xwe berdim, rabû min berê xwe da bajarên Edenê û Mêrsînê. Li Edenê hevalekî ez girtim û got: Ez li asîmanan li te digeriyam vaye tu li erdê bi dest min ketiye. Gelek lava û tika ji min kirin ku ez pê re herim dezgeha ku ew têkiliyê pê re dike.

Min jê re got: Mane mêvan dîlkiriyê mêvandar e. Hevalê min got: Ev çend salin ez têkiliyê bi karbidestê vê çêkirgeha caman re dikim, vî kesî ez û gelek karkirên ku li nik wî di dezgehê de kar dikin, em xistine qaqa reş, em xistine tewla dewaran; zimandirêjiyan dike, serdestî me ye, ew xwende ye û hem baş bazirgan e. Neçare em rûxandine, em li ber bê çare ne.

Institut kurde de Paris

Hevalê min gote min: De hela îro bê tu wî na tevizîne! Tu hinekî rûmetê ji mere vegerîne. Bi Xwedê vî kesî em pîs û tune kirine.

Em çûn dezgeha caman. Min mirovekî gewr û boz dît, li pişt masê rûniştî bû, temenê wî nêzî temenê min bû, ji çehr û rûçikê wî xuyadikir ku Tirk e, min silav lê kir, ew jî rabû bersiva min da û bi toreyî xwest ez rûnêm.

Hevalê min ez pê dame nasîn, wî jî ciwamêr pêşwaziyeke germ ji min re kir. Bi zimanekî bajarî ez li ser çavan û ser seran danîm, û dest bi dest gote min: Ev heval û kesên te başin, karkirin û nimêjkirin, lê mixabin nezanin. Û xwe bi min da nasîn ku ew dîrokzane, konevane, olpereste û baş bazirgane. Pesnên xwe bi dûv hev ve rêz kirin.

Di fersenda anîna çayê de hevalê min bi nîv dizî ji min re got: Te bihîst? Heger îro tu wî pîs bikî, çîz bikî, ezê xwe bi qurbana te bikim.

Em li nivîsgehê rûniştîne, çayê bi dûv qawê re tê, pir kêfa xwe - di nav dabaş û gengeşê de- ji min re tanî, ji ber ku

Institut kurde de Paris

hevpeyvên me diketin gelek xaçerêkan, di nav re xwe da nasîn ku xwende ye; xwendina bazirganiyê kuta kiriye û ew ji nav Tirka ye, lê hatiye li deverê ev çêkirgeh ava kiriye, bi sedema erzaniya karkiran, nêzîkbûna Iraqê. Û her û her beyan dikir ku xelkên we di tariyê de ne, lê karkirin û dilpakin, bi hevalê xwe re rastin. Min jî pirr serî lê mezin dikir, û yek caran min jê re digot "Weke te ye, tu rast dibêjî". Min nerînên wî qedexe nedikirin. Min sipasiya wî dikir, ji bo ku xelkên me yên xizan û koçeber derbasî kar dike.

Hevalê min nema xwe girt, dixwaze min û yê karbidest derbaske qada gengeşa siyasetê, rabû bi hêdî û dizî nuqu çand yê karbidest û jê re got: De ka heger tu mêrî û tu Pîlotî tu wê bi amê min re hevpeyvîna siyasî lidarxînî?! Bersiva wî da û got: Xelkê Sûrî zana ne, ma weke we ne!

Lê xuyabû ew jî laşê wî dixuriya, biryara hevalê min lê xweş hat û bi lez serê hespê xwe berda, û da nav davan, bê tirs û bêyî ku mûyek li zimanê wî bigere got: Em Tirk û Kurd birayên hevin; me bi hev re Esîtane vekir, me bi hev re şerê xaçperestan kir, me

Institut kurde de Paris

bi hev re Qudsa pîroz aza kiriye, vaye em bi hev re kar dikin, ma şerê navbera Kurd û Tirkan ne herame? Ma ne birakujiye? Ola me yeke, Heca me yeke, Qur`ana me yeke. Û ji min re dûbare kir: Ma gotinên min ne rastin?. Min jî digot: Belê, hemû di cihê xwe de ne. Lê hevalê min hişmatî mabû û di xwe de dipiçpiçî, kirî bipeqiya, lê min jî di nav gengeşê de ew hajdikir ji bo xwe bigire û ne peyive.

Ez bi xwe serê xwe jê re dihejînim û ala sipî jê re hildidim. Di wê bihnikê de karek wî çêbû, ew çû. Rabû min bîna hevalê xwe fereh kir û min pê da nasîn ku min bersivek jê re amade kiriye, ezê wî şaş bikim û li davan biqelibînim.

Ciwamêr vegeriya, û ji min xwest ku ez qasekî bipeyivim. Min jî dest bidest –bi Tirkiya xwe ya qels– jê re got: Birayê hêja û zana! Ka were ez û te bazarekê bi hev re bikin. Da em serên hevûdû ne êşînin. Hinekî ponijî lê dawî got: Temam. Başe, ka bazara xwe bibêje. Hevalê min dîn û har bû, eşkere got: Xoce Tu nikarî bazaran pê re bikî. Vî kesî bazirganên Edenê tev qûnrim kirine. Dûvre te kengî bazar kirine?! Lê min



Institut kurde de Paris

ew haj kir û ji yê karbidest re got: Ez dê bazara xwe bêjim û ez bi hêvî me ku here serî, û em herdû sûdeyekê jê bibînin û em ta mirinê bimînin birayên hev.

Wî bi xwe gotina bazarê û gotina sûde jê bihîstin, pirr dilşad bû û got: Hema ez dezgehê li ser vê bazarê deynim ez lê naqulipim.

Hevalê min careke din kire niçeniç: Min digot qey tê îro hilê wî li milê wî kî, lê çû!!

Min jê re got: Birayê hêja û bi rûmet, birayê min ê misilman! Raste em birayên hevin, de ka Tirkan bixe zikê xwe û xwe bixe şûnda wan, û ezê jî Kurdan bixim zikê xwe û xwe bixim şûnda wan?

Hinekî bêdeng ma, ponijî, lê neçare got: Min qebûle.

Min jê re got: Birayê Tirk ê misilman, de ka emê Qur`ana Kerîm bikin destûr û yasa vî welatî û zimanê Qur`anê bikin zimanê vî welatî, ne hûn bi Tirkî bipeyivin û ne em bi Kurdî.

Hevalê karbidest destê wî li kar jî sist bû, bi serê tiliya rastê xweliya çixara xwe avête derveyî xwelîdankê û baş ramiya. Dawî, peyva ku got ev bû: Xelîl abê, min ji tere got

Xelkên Sûrê zana û zîrekin. Ji vir û pê ve ez hevalê Kurdan. Welleh Kurd rastin û Tirk ne rastin. Vellahî Kurd heqlîne yaho!.

Institut kurde de Paris

## Çîrokin ji dîrokê

Ez dê van çend çîrokên dîrokî li ser naveroka pendên Kurdan û zargotinên bapîran ava bikim, ev pendên ku li gorî ezmûnên wan hatine bikaranîn, û ketine ser zimên.

Belam gelê me bawerî bi wan gotinên pendî û watekûr ne anîne, ji loma nifşên bûrîn gelek caran ketine şaşitiyên mal wêran û qirkirinê, lê mixabin nifşên bi dûv wan ve jî hatin û ketin wan gunehan, havil ji bûyer û ezmûnên beriya xwe ne dîtin, ta îro em baweriyê bi wan nakin, ji xwe re nakin felsefa jiyanê û şêwazên danûstandinê, çima me û wan bapîran û pêşiyan ji sedên salan ve tiştekî bi sûde ji vî miletê bindest û reben re ne kiriye? Di baweriya min de, sedem ewe ku em baweriyê bi hev û ezmûnên hev nayînin, û ji kevin de Kurdan gotine: «Yê ku mar pêvede, ji werîs jî ditirse». De kanî emê li çîrokine dîrokî guhdarî bikin, emê binerin kanî ev penda hêja ketiye serê me û me jê sûde girtiye yan na?!

Institut kurde de Paris

## 1- Kuştina Restem û reva Kesra

Dema ku serok leşkerên misilmanên birçî û tazî çavê xwe berdan Impiratoriya Kesra li Iraqa rengîn, Iraqa bi dar û devî, bi av û çem û kanî, bi rez û gulzar, bi qesr û qûnaxên belek, ciwamêran bi hesanî Restem kuştin û Kesra reviya; kete nav miletê Kurd û Faris. Ji nûve hat bîra ku «mirov bê Xweda dibe, lê bê xwedî nabe», ji wan re got: "Ev Erebên kujyar, ne hatine ji bo guhertina ola me, lê belê hatine dixwazin qada me dagir bikin, seroktiya me biherifînin, fermandariya me tune bikin".

Çiqasî Kesra kire hawar û gazî, kes lê xwedî derneket. Û Kurd dibêjin: «Mirov bê Xweda dibe û bê xwedî nabe». Kesekî li Kesra yê serxweçûyî û payedar guhdarî nekir, û dawî Kurd û Farisan ola pêxember Zara berdan, qada xwe jî ji misilmanan re raxistin, serê xwe li ber lingê hespên wan xûz kirin. Misilmanên Ereb ji nav qûmê û kuliyan hatin nav dar û deviyan, ew kezîzer

Institut kurde de Paris

û zeriyên nazenîn li xwe parkirin, Eywana Kesra talan kirin –ta îro maye kavil- zêr, zîv, gewher û çi tiştên giranbuha birin, û bûne Qiral û Sultanên Kurd û Farisan, û ew li ber dergehê mizgeftan kirin qerdiyan, û ta roja îro Kurd û Faris bi xwe hay nebûne, bi hêviya ku bi buhiştê şabibin!.lê bi taybetî dijminên kurdan her û her ji re wan dibêjin û di serê wan de dixwînin ku dianya ne ji tiştekî re ye xwedê mirov bê din û îman nebe gorê bela mal û dewleta me tune be.

Institut kurde de Paris

## 2- Êlên zêrîn

***(ji çîrokên Megûlan)***

Dema êlên Megûlan Kurdistan û Faristan wêran û talan kirin, bi hezaran gund û bajar sotin, kirin kavil. Keleh, qesr û qûnax herifandin. Bi hezaran mîrek û qiral, leheng û qehreman kuştin, namûsa Kurd û Farisan berebat kirin. Wê çaxê misilmanên Ereb ji Bexdê, ji Mekke û Medînê, ji Misr û Mexribê dilopek histir ne barandin. Ji lewra wan digotin: Em Ereb in, em kurmamên pêxember in, em yên nav mitêlê ne, kî kê bikuje, kî kê biqelîne, her dawî wê bêne destê Xelîfê li Bexda ramûsin. Ereban, Kurd û Faris ji xwe re kirin bendav û mertal, û gotina wan jî kirin yasa û sîmbol; ya ku dibêje: «Hin dikin û hin dixwin».

Lê dema ku Farisan dîtin bê Xelîfê islamê yê Ereb çi finas û xirabiyan dikin, û hay bûn ku ola islamê ne di hiş û ramanên wan de ye, tenê qîzik, mey û sema di jiyana wan de pîroz in, kêfxweşî li nik wan ne nimêj û rojî ye, rabû Farisan xwe ji wan dûr kirin, û

Institut kurde de Paris

dewleta xwe ava kirin. Belê Kurdên nezan û hov, mane navmaliyê Xelîfe û parêzerên mizgeftan, mane kolên Ereban, ta îro piraniya şêxên kurdan nijadê xwe dixine bin piyên xwe û dibên em Islamê dixwazin û hew.

Xelîfên islamê yên Ebbasî; ew xelîfe yên ku Kurdan -bi saya Ebû Mislim ê Xurasanî- stûna dewleta wan danîn, wan E.M. Xurasanî kuştin, malbata Bermekî talan kirin, serokên wan hemû kuştin yên weke zanyar û qehreman Xalidê Bermekî, û Yehya yê Bermekî. Wisa jî gelek serokên Kurdan bi wan re koçber bûn, pijiqîn, li nav çol û çiyayên Kurdistanê belav bûn, û ta îro Kurd li xwe hay nebûne, û hîn pesnê Xelîfeyên misilmanan didin, wan xwedayî û pîroz dibînin, û gotina bapîrên xwe yên Kurd nayînin bîra xwe, ya ku dibêje: Gelek caran, qencî dibin xerabî, û hinek dibêjin ji ber qenciya ev ecêb hat serê min.

Institut kurde de Paris

## 3- Çîroka Ertoqiyan û Umerê Eyûbî

Selahiddîn; şêrê çiyayê Araratê, pilingê Dewînê, Mîrê xortên Rewadiyan, vî lehengî hêzên mezin ji Hekarê, Şehrezûrê, Amedê û Şingalê kişandin ser Xaçparêzan, ji wan xwest ku vegerin Ewropa xwe, û divê ku zanibin, ku qada Ereban a pîroz ne yexme ye, ne bê xwedî ye!.

Di wê demê de, êla Ertoqiyan a Tirk Kurdistan xistibû bin siya şûrê xwe; zordarî û sitemkarî li Kurdên reben dikirin. Xortê bi namûs û miletperwer Umer kurê Toran şah; birayê Selahiddîn, ji amê xwe Selahiddîn xwest ku destûra wî bide, da here mîrekên Ertoqiyan birûxîne, welatê Kurdan ji destên wan derxe, û mîrekên Kurd li dewsa wan deyne, jê re got: «Amo! Çêlîkê maran bê jehr nabin. Ev jî bernayên Holako ne».

Dîrok dibêje ku Selahiddîn pirr ji Umer hizdikir, gotina wî nedişkand. Jê re got: De here, destê te ji te re.

Umer derbasî Kurdistanê bû. Gelek mîrnişînên Ertoqiyan ji qurm de rakirin. Lê

Institut kurde de Paris

mixabin û sed mixabin, ku Umer, beriya ku berê xwe bibe serî, ew hêja, ew qehreman li bajarê Xelatê can da, çû ber dilovaniya Xwedê «Ev jî bextê Kurdan ê reş e».

Dîroknûs dibêjin ku, çaxa Selahiddîn ev salox bihîst gelekî xemgîn bû, ta ku hêsir barandine û giriye.

Bê goman, wê Umer kurê Toran Şahê Eyûbî dewletek kurdî damezrandiba, wê Heskîfê bikira Paytexta wê. Kuramêd wî hatin û Heskîfê kirin Paytext, lê êlên Megolan, êlên zêrîn ne hiştin Kurd bi dewleteke serbixwe şa bibin, tenê bûne Mîrnişîn, dûvre Beglik, ta ku Eyûbî ji dîrokê derketin, û neviyên wan li cîhanê belav bûn, lê goristana Heskîfê tijî tirbên wan mîrekên Eyyûbiyane, ji ber ku bajarê Heskîfê (Hesen kêfê ) paytexta Eyûbiyan ya siyemîn bû pişti Qahire û Şamê û piraniya binemalên Eyûbiyan hatin Heskîfê û gundên derdora wê ji xwe re girtin, bi navê xwe tapo kirin, dawî Eyûbî çûne bajarên mezin, û xweşî dîtin, gundên xwe jî firotin kurdan û hinek jî dane navmalî û pêmayên xwe ewên ku îro ji wan re dibêjin Mihelmî.

## 4- Çîroka kevirê bi qul

Sala 1887an şerê Rûs û Osmaniyan li darket. Careke din Kurd bûne êzing û ardiwê vî şerî –weke şerê navbera Osmanî û Sefewiyan-, leşkerên Rûsî bi hêztir û çalaktir bûn, lê yên Osmanî pirtir bûn. Leşkerê Horos –weke ku Kurdan bilêv dikirin- derbasî welatê me bûn, ne welatê Tirkan. Kalepîran digotin: «Leşkerê Horos gihane "Kevirê bi qul"» –ew kevir nêzî Bedlîsê ye-.

Di wê xirecirê, wê berdîberdanê de Kurdan alîkariya Tirkan dikirin, û bi xurtî şerê "gawiran" dikirin.

Kalepîran digotin: Dewleta Qeyserê Rûsî şandek şande nik Kurdan, û ji wan re got: «Heger hûn şerê Çildêrê di bîra xwe de bînin, heger hûn çîroka Ebû Mislim ê Kurd ê Xurasanî di bîra xwe de bînin, heger hûn kar û xebata Kurdan di ber islamê de di bîra xwe bînin, heger hûn hebin, emê dewleteke Kurdî ji we re damezrînin. Vaye hûn dibînin em îro dagirkerên Kurdistanê ne, û leşkerên Osmanî ji welatê we derketiye.»

Institut kurde de Paris

Kalepîran digotin: Mele Xelîlê Sêrtî gelekî kefteleft kir, xwe gihande Axa û Melan.. dawî ew û çend Mele û Axa çûne nik şêx Hezret. Ev biryara "Horos" jê re gotin. Şêx ew kar û xebata wan qedexe kir, ew şermezar kirin, û ji wan re got: "Ma çawa em dê şerê dewleta Elî Osmanî bikin! Ma ne îro ew Xelîfê islamê ne! Ew stûna ola islamê ne. Çawa em dê bibin hevalên gawiran?!."

Rebenê mele Xelîl û çend hevalan ji sofiyên şêx tirsiyan, gotina Kurdan jibîr kirin «Heger bayê te rabû kevira biderê!» û «Ku te da nav avê, çi li çogê, çi li navê».

Lê ez çi bikim, vê olê Kurd kor kirine, bê hêz kirine. Piraniya şêx û melayên ola islamê xiniziyê ji dijmin re dikin, nijadên xwe, û bapîrên xwe dixin bin piyên xwe, weke ku şêx Seîd ê Botî, bê fedî û eşkere got: "Ez nijadê xwe diximе bin piyê xwe". Ev şêxê ku bi sedhezaran mirîdê wî hene, li Şamê rûniştiye, jiyaneke bajarî û kêfxweşî dibûrîne, û merivên wî li derdora Dêrikê û Cezîrê bi mêranî û şerefî avdanê û çandiniyê dikin.

Institut kurde de Paris

## 5- Çîroka Kurdan û Cezair û Felestîn

Em xort bûn. Em xurt bûn. Em Şo'î (Komonist) bûn. Me dida dûv Sînem keça Cegerxwîn û em derbasî sentera bajarê Qamişlo dibûn. Sînem rêbera me bû, wê bang dikir:

***Bimre impiryaliya Frensa. Azadî bo Cezair. Bijî Bin Bêlla. Bijî Cemîla Buhirêd. Divê Frensa ji Cezair derkeve.***

Me ev simbolên çûyî bi dûv de vedigerandin.

Wisa jî, ji bo alîkariya miletê Cezair û rizgarkirina wî 250 dused û pêncî Sîpe û zarokên weke gul û kulîlkan di sînema Amûdê de hatin sotin, bûne gorî û qurban ji bo azadiya Cezair.

Piştî ku Cezair aza bû, gihişte armanca xwe, bû dewleteke Erebi serbixwe, serokê wê Hewwarî Bûmidyen, Seddam û şahê Îranê li nik xwe vehewandin, û peymanek di navbera wan de ava kir –Peymana Cezair 1975- peymana ji bo têkoşîna Kurdan li Iraqê beravêtî bikin. Bi vê peymanê xebata Kurdan avêtin bermîla pîsîyê.

Institut Kurde de Paris

Çîroka me û filistîniyan hîn kamaxtire, hîn balkêştire.

Ji sala 1947an de em di şer û cengê de ne, dijî hatina Cihûyan, û berya berê jî me Quds azakir, lê mixabin filistîniyan qada xwe, bi xwarin û vexwarinên xweş û navnivînên nerm û germ, difirotin û ji Filistînê derdiketin.

Weke berevaniya me ji Cezair re, me bihtir ji Filistîn re kir. Me gelek şehîd –di şerê Sûrî û Israîl de, di salên 1967, 1973- danîn. Ji bilî wan şeran jî, rojname ya me –komonistan- û weha jî yên piraniyên rêxistinên Kurdan, her jimar bi xêzeke qalind problema gelê Filistîn û azakirina qada wan dinivîsand, û di cîhanê de her û her berevanî û piştgiriya filistîniyan dikirin -û hîn jî dikin!-.

Lê bila Kurd zanibin –û dengê min diçe wan-. Bila Kurd şiyar bibin, dost û dijminên xwe ji hev nas bikin.

Serokê filistîniyan –Yasir Erefat-, piştî bumbebaran-kirina Helebçe û Xormal bi çekên kîmawî, Erefat çû Bexdê, û bîneke dirêj Seddam himêz kir, enya wî maç kir û jê re got: "Îro, min navê te kir (Seyful ereb;

ango şûrê Ereban)!

Ji bo ku Seddam Kurd sotin û qirkirin, Erefat ev xelat pê ve kir, û bi vî hawî Erefat bi ser gora pakrewanên Kurdan de mîz kir; ew Kurd ên ku di şerê Cuhû û Ereban de şehîd ketin.

Wisa jî tekoşera filistînî Henan Eşrawî dibêje :

Ev Kurdistana ku li bakurê Iraqê çêdibe birîneke di laşê netewê Ereban de, wisa jî helbestvanê Filistînî Mehmûd Derwîş helbesta xwe ya bi navê Kurdistan ji dîwana xwe çapa sisiyan derxist.

Institut kurde de Paris

## 6- Çîroka komonistan û Kurdan

Di salên derdora 1950 de, partiya Komonist rehên xwe berdan nav Kurdan, û bi taybetî Kurdên parêzgeha Hesiça (Cezîrê). Destpêkê li bajarê Amûdê belav bû, piştre li bajarê Qamişlo. Bi hezaran Kurdan xwe li vê partiyê girtin. Sedem jê ev bûn:

A) Zemîndarin hov û nezan (ji xwe re digotin "Axa") li deverê hebûn, zordarî û çavsorî li cotyaran dikirin, weke kole û navmalyan li wan dinerîn.

B) Komonistan ji Kurdan re digotin em dê sosyalizmê pêkbînin, dûvre emê dewletek Kurdî ji we re damezrînin.

C) Di wê demê de çend zana û şoreşgêr ên ku beşdarî di şoreşa Şêx Se`îdê Palo de kiribûn, reviyabûn; binxet bûbûn; weke: Osman Sebrî, Reşîdê Kurd, Hesen Hişyar, Dr.Nafiz, Mele Eliyê Topiz û Cemîlê Qedrî Paşa. Van kesan bîna komonistiyê kirin, ewan dizanîbûn ku Rûs dijî Tirko ne, bihtir xwe li dor partiya komonistan dane hev, û Kurd ên binxetê jî handêr kirin, ji bo bibin komonist.

Institut kurde de Paris

D) Wê demê partiya Kurdan jî ne hatibû damezrandin û ti partiyên din jî li deverê tune bûn.

Partiya komonist kete nav civata Kurdan, weke agirê ku li çilo here, di nav Kurdan de belav bû. Ji hemû çînên civakê tevlî partiyê bûn; ji Axan du Axa bûne komonist (Hisên ê Haco û Cemîlê Merê), ji Melan Mele Şêxmûsê Hesarî (Cegerxwîn), Mele Şêxmûsê Qerqatî, û Mele Şêxmûsê Şêxî. Ji sofiyan yek navê wî sofî Brahîm bû, ta niha jî zindiye.

Ya balkêş di çîroka belavbûna partiya komonist de ewe ku yekî Ereb derbas nebû vê partiyê!

Kurdan xebateke bê hedan di ber komonistan de kirin, ta ku bû yekemîn partî di parêzgehê de, û her û her zanyarên Kurdan û şagirtên dibistanan doza xwendin û nivîsandinê bi zimanê Kurdî dikirin, lê berpirsiyarên Şiyûiyan yên bilind, yên li Şamê rûniştî ev daxwaz qebûl nedikirin. Piştî demek bûrî û tavika rokê ji bin ewrên reş derket endamên Kurd di partiyê de doza mafin Kurdan kirin, lê komonistan ji wan re digotin:

Institut kurde de Paris

Ta em welatê Ereban bixin bin sîstema sosyalîzmê û komonist li deverê bibin fermandar, wê çaxê emê binêrin çi mafî bidin Kurdan (Kero nemir heta bihar bê û qîvar şîn bên)! Wê çaxê Kurd bi xwe haybûn û piraniya wan Komonist berdan, gihane partiyên Kurdan yên ku hatin ava kirin, û dawiya dawî gotina bapîran anîn bîra xwe:

«Karkirê xwe be, şêrînê ber dilê hevalan be».

Lê mixabin û sed mixabin miletê Kurd dilpake, bilez tê xapandin û ta ku kêr negihê hestî bixwe hay nabe.

Institut kurde de Paris

## *Xewnên Seddam*

Piştî ku Seddamê hov û nezan, bi xwêdan û keda gelê Iraqê dewleteke yekemîn bi hêz û çekdar di Rojhilata navîn de ava kir, ew serokê zikreş û paşverû çavsor bû. Li çekên xwe yên sivik û giran temaşe dikir, li gewde û qilafetê xwe dinerî, destê xwe di ser stêrên ser milê xwe re dibir û tanî. Her roj diçû serdana top û tengên pesindar, diçû qada balefiran meyze dikir ew balefirên Horos ên giranbuha didîtin. Li wan ziktilêrên payedar ên bi xelat û nîşanan xemilandî temaşe dikir. Her roj dengê sirûda Be`isiyan dibihîst. Wisa jî di wê demê de Seddam du kurên –weke pilingan- li dor xwe didîtin, vêca her şev xewnên pîs û ne xweş dihatin xewna wî û ji wan bawer dikir.

Şevekê ji şevên Xwedê, Seddam di xew de veciniqî, çeng bû li ser textê zêrîn ser nişkave qûna xwe rûnişt, Diya Ûdey lê hay bû, rabû bi lez av jê re anî. Wî jî firek vexwar û çend sixêfên tewşe-mewş ji Farisan re dan û kulmişî, careke din kete



Institut kurde de Paris

nav xewnên gincirî.

Beyanî, Seddam ji xew rabû, kincên Generaliyê wergirtin, bi saryanê re çend xwedî nîşan û kole şiyar kirin, civîneke cengê çêkir, ji wan xwest ku xewna wî bi cih bînin, ji wan re got: "Ez dê qada Ereban ji wan sofîkên Farisan bistînim. Min wisa di xewnê de dîtiye û hew".

Wan payebilindan xewna wî pîroz kirin, û jê re temane rawestîn û gotin: "Em dixwazin tu çav bikî me û tiwê hunerê me bibînî". Seddam ji xwe û wan re digot: "Ev dem dema me ye. Emerîka û Ewropa ji van sofîkan acizin, li wan bi kînin, ji wan hatine serê bêvlê. Ji xwe hevalbendên min ên Horos li ber guhên min xistine ku balefirên nûjen ji min re rêkin. –û ji xwe re xweşdikir û digot- Ez dê di heft heşt rojan de Ehwazê ji destê Farisan derxim, bi ser qada Iraqê vekim".

Seddam yek nekir dido, hêzên leşkeran kişandin sînorê Îranê, biryar da ku xewna xwe bi cih bîne, lê sofîkên Îranê riha xwe xistin devê xwe, û kilîta buhuştê xistin hustê xwe, bûne bendav li pêşiya leşkerên Seddam rawestiyan, û çaxa sed dihatin



Institut kurde de Paris

kuştin, dused diketin şûna wan.

Seddam heft heşt salan şer bi wan sofîkan re kir, ti çeq di wan de nekir. Milyonek ji miletê Iraqê hate kuştin, Milyarên dolaran hatin rijandin, Seddam polîpoşman şer rawestand, neçar peyman bi Farisan re muhr kir, ji nû ve peymana Cezair a 1975an bi bîr anî.

Careke din Seddam xewnek dît, bi lez û bez ew generalên suxte û kole civandin. Ji wan re got: divê em van Kurdan ji nav xwe rakin, wan biqelînin, sedema ku me Ehwaz da Farisan ev Kurd bûn.

Hemiyan xewna wî pîroz kirin û serê xwe jê re danîn û gotin: Em amade ne.

Seddamê bê ûjdan û bê ol Helebçe û Xormal, bi xerdel û siyanîd û kîmyayê bumbebaran kirin; zarok, pîr, xort, keç, lawir, tilûr, û geya hemû sotin. Bi hezaran ji Kurdan zindî binax kirin.

Wê çaxê Seddam digot: "Em vêca bi ser ketin". Wê çaxê serokê Filistîtiyan Y.Erefat çû Bexdê û Seddam ramûsa, û ew xelat kir û jê re got: "الآن أسميتك سيف العرب; Niha min navê te kir şûrê Ereban".

Ew bê bext û telaqreş ê ku Kurdan jê re

Qudsa pîroz azakirin, ew gotina genî ji devê wî derket.

Dîsa kela dilê Seddam hênik nebû, û xewneke bi gincir dît. Careke din ew sermezin û ziktilêr dane hev û ji wan re got: "Gelî payedaran, û xwedî hêz û nîşanan! Em nikarin bi xelkê, ma em nikarin bi xwe jî?! Ma ev çi mîrnişînên pîsik û biçûkin? Kê ew di vî kendavî de çandine? De hela em şegekî li Kuwêt û Si`ûdiyê xin; em petrol û heccê bixin destên xwe. Ez dê xwe bikim Qiral, yan Impirator ê Ereban, dawî jî ez dê xwe deynim Xelîfê islamê, taca Xelîfê li ser serê xwe deynim. Ma kî himber min heye? Ji xwe min ji Emerîka re jî gotiye, ewan gotin: «Hûn Erebên hev in. Hûn kuramnên hev in, ya me çiye!»".

Wan pîrpîrên generalan gotin: "Xewn xewna te ye. Te xwendîtiye û tu zanî. Em di bin siya gunê te de ne. Em bendewarê fermana te ne".

Welê em –û her kes- dizanin, ku dewletên cîhanê û cîranan xewna wî ya pêşî qedexe kirin û jê re gotin: "Ev xewna te pîs û ne xweş bû, divê tu cihê serê xwe xweş bikî, û nebî tu careke din xewnên wisa bibînî, emê

Institut kurde de Paris

vê carê bên û cihê serê te xweş bikin".

Belê Seddamê hov, qapanê ew mest û gêj kiribû. Bi xurtî û tundî êrîşek berda Kuwêt a bê hêz. Di şevekê de û bê leşkerê giran ew dagirkir, xiste bin destê xwe. Kiryarin kirêt, û finasin genî di Kuwêt de kirin; rûmeta Ereb û "Urûba" xist bin pêlava xwe. Ew bajarê hêja û maldar berebat kir, gencînên wan û kevneşopên wan talan kirin. Lê vê carê dewletên cîhanê hatin ji bo cihê serê wî xweş bikin, wî ji nav pencên xewnên ne xweş derxin, wî bikin nimûne ji dawiya sitemkaran re.

Emerîka û hevalbendên xwe arteşên çekdar anîn pendavê, Seddam ji Kuwêt derxistin, çûn Iraq jî dagir kirin, Seddam û kurên wî, kole û hevalên wî kuştin.

Lê bi rastî, heta hûrdema dawî jî Seddam digot: "Ellahû ekber. Hîn jî ez dibêjim, xewnên min rastin, û ez şûrê Ereba me, û kes nikare şûrê Ereban bişkîne!".

Institut kurde de Paris

## Çîroka bajarekî

Xume- xuma sûlava cobarekî bû, ewê ku ji çemekî cihê bûbû, xweş li deverê belav dibû. Weha jî ew sûlav sivik sivik dernexûmî kortekê dibû, bi lez û bez winda dibû, lê mirov dengin balkêş dibihîstin; yek jê weke ku wê avê kulm û şeqam li çend perwanan dixistin, ew di ser hev re diqulipandin, wan jî bi hêrz û kîr. du ferên aşan ên mezin –li ser hev paldayî- digerandin. Herdû ferên aş –wisa bi nav dibûn- ervanên gundiyan hûr dikirin, lê dengê balkêş ne xume xuma avê bû, lê belê yê çeqe çeqa perwanan bû, û di wê demê de xelkê ji wî aşî re digotin "aşê çeqçeqê", û dûvre navê wî çemê ku ew aş digerand bû çemê Çeqçeqê. Ereban jî di pirtûkên xwe de dinivîsî "Cexcex, yan jî Ceqceq"; ji ber ku tîpa "ç" di Alfebêya wan de tuneye!

Gundiyên derdora aşê Çeqçeqê –bi taybetî ji deşta Xelef Axa, deşta Mêrdînê- bi saryana sibehê re ervanên xwe tanîn vî aşî. Ji hev re digotin «Em dê herin aşê Çeqçeqê ervanê

xwe bihêrin û hem jî ji xwe re qamîşê ji qiraxên çem bibirrin û bînin malê». Vêca bi vê sedemê navê wî aşî bû aşê "qamîş lê", û çaxa ku xanî û qûnax li derdora êş ava bûn, navê wî gundî –dûv re yê wî bajarî- kirin Qamîşlê. Dûvre ev nav bi gelek rengan hat bilêvkirin, weke: Qamîşlê, Qamişliyê, Qamişlo, Qamişlokê û Qamişlî, lê Kurdan navê Qamişlo pejirandin.

Berya ku dest û lingên dewleta Elî Osmanî jê bikevin, kesek li dever û derdora van aşên çeqçeqê tune bû, bilî qeraşê aşê Qidûr beg û qeraşê aşê mala Gozê, û di biharê de çend konên xwedî pezan li perava çemê Çeqçeq datanîn, ji ber ku ti kesî newêrîbû cîrantiya ava Bûnisra (çemê Çeqçeq) bikira. Ev çem û rûbarên xwe bê ol bûn; ava wan zikê mirovan diwerimand, tilêr dikir, zarok û mezin pê dimirin. Tilûrê jê vedixwar ji asîmanan dihatin xwar û dimirin. Siwarên hesp û keran ji hevalên xwe dipirsîn: De hela binêr ma sewala min avê vedixwe?

Ew nexweşiya malmîrat zarokên deverê dilkuştin, xelkê deverê jê re digotin "Taya Bûnisra", û hina jê re digotin "Zikêşa Şanîşê



Institut kurde de Paris

û Bawernê". Rûniştevanên deverê digotin: «Kaniyek ji girê Girnewas xwe berdide ser ava Bûnisra; ew kanî ji mîza cinên Girnewas e». Wê çaxê jî Kurdan digotin: «Girnewas bajarê cina ye, û paytexta mîrê wa ye».ji lewra nexweşiya "Bayê cina" li deverê pirr heye.

Dema cenga yekemîn a cîhanê kuta bû, bahoza şer û kuştinê derbas bû, aştiyê konê xwe vegirt. Xurtan kelaşên qelsan perçe kirin û li hev par kirin. Dewletên Ewropî serkewt û serbilind ji cengê derketin, gelek peyman bi hev re danîn, gelek vîlik û dolab – bi dizî- di nav xwe de gerandin. Di civata pişkê de Sûrî û Libnan bûne para Frensa, Misr, Urdun û Iraq bûne ya Ingilîzan. Wê çaxê Filistîn jî dane Cihuwan.

Vêca dema dagirkerê Frensawî derbasî Sûrî bû, ma gelo wê kî himberî wî raweste? Ereboşkên şivan ên çolê, yan Filehên çavşikestî û reben? Na, û sed carî na. Ne ew himberî dagirker rawestîn, wê çaxê qehremanekî Kurd hebû navê wî Yûsif Ezmê bû, ne Yûsif Selahiddîn bû, lê weke wî mêrxas bû. Vî qehremanî û çend neferên hêja dilpak ketin pêşiya leşker û hêzên



Institut kurde de Paris

Frensawî yên çekdar û xurt; xwedî tank û top. Weke şêr û pilingan şerê xwe kirin ta ku şalyarê berevaniyê Yûsif Ezmê şehîd ket û Frensawî derbasî Şamê bûn. Piştre dagirkerê Frensawî hêzek leşker şandin devera Cezîrê; parêzgeha Hesiça. Lîderên Frensawiyan Filleh û Cihuwên Nisêbînê vexwendin binxetê, û zemîndarên weke malbata Nîzamiddîn û Qidûr beg û Taha Çelebî, û mala Elo û Edê ew jî handêr kirin ji bo dakevin binxeta Frensawî, bêne qada xwe û gundên xwe bi parêzin.

Wisa jî Frensa di sala 1927an de destpêkir leşker-gehek mezin li şûna goristana Nisêbînê ya kevnar ava kir. Zemîndar jî hatin qesr û qûnax ji xwe re ava kirin. Piştre, Frensa şaneşînek ji fermandarên dewleta Sûrî –ya ku di bin destê Frensa de bû- ava kir.

Xortekî Kurd; zana û payebilind –di sala 1932an de-kire serok komarê dewleta Sûrî; navê wî Elî Abid bû, wî jî qayimeqamek li Qamişlo –di wê şaneşînê de- danî. Frensa Incînerek navê wî Xeralempo bû anîn, nexşe û pirojeyek spehî ji Qamişlo re danî. Dûv re yekî Îtalî navê wî Kwas bû hat hinekî ew

nexşe guhert û xweştir kir. Dagirkerê Frensawî gelek aşxane, sînema, tyatro, ûtêl, meyxane, çayxane, dikan û eresak sergirtî ava kirin.

Mirov hişmatî dimîne çawa bajarek weke Qamişlo di kurtedemekê de mezin bibe. Belê çend sedemên bingehî hene, û hin hîmenên xuristî jî hene, mirov dikare van çend xalan bibêje:

Yek jê eve, ku gelek gelên cûre cûr hatin Qamişlo, ew ava kirin; Cihû, Ermen, Suryan û Kurd.. van gelên tîvel, ji girr hev re avahî û dikan ava dikirin.

Ya din, ji ber ku ev gel hemû ji bin siya olperestên Osmanî derketin û çav berdan pêşketin û bajartiya Ewropa. Wan gelên tîvel û celeb celeb, û bi alîkarî û saya Frensa –wê dewleta Ewropî- ev bajar pêşxistin. Vêca bi sedan serokên êlan, hunermend, zanyarên ku ji ber Tirkan direviyan, şanokar, helbestvan, stranbêj, textor û dermanfiroşan xwe li Qamişlo digirtin, ta ku navê wê bû «Bûka Cezîrê», yan jî «Parîsa Rojhilat».

Gelek serokên hêja û bi rûmet hatin Qamişlo, weke: Şikrî Qewetlî, Cemal



Institut kurde de Paris

Ebdinnasir, Hafiz Esed, serok Mes`ûdê Berzanî, Celal Talibanî.. û bi sedan siyasetmedarên Kurd ên koçber dihatin vî bajarî, û ya balkêş eve; Ta îro kalepîr hene dibêjin: Bavo, ev çi li dinyayê çêbû! Doh bû şûna vî bajarî guhera pezê me bû, çêrgeha dewarên me bû!?

Institut kurde de Paris

## Qelenê Qada me

Ji roja ko gelê Kurd ola Zeradeşt pêxember berdan, û bi ola islamê girtin,Kurd ji vê olê re bûne rêjber û kole, bûne navmaliyên şêx û tekiyên vê olê.

Gelek miletên vê deverê –bilî Ereban- bi ola islamê girtin, weke Faris, Tirk, Pakistan, Efxan, û..hd, belam van ciwanmêran ji xwe re dewlet ava kirin, nebûn navmalî û kole ji islamê û Ereban re. Miletî weke yê Kurd kar û xebat ji islamê û Ereban re nekiriye, û ta îro. Kurdan xwe ji islamê re kirine ax, û axa xwe jî jê re kirin qurban. Çaxa mirov li dîrokê vedigere, wê dixwîne, porê serê mirov radibe, dibe weke pîjdankan, mirov dibîne û pê hay dibe ku evqasî Kurdan alîkarî û qencî ji islamê re kirine, û himberî vê qenciyê, birayên misilman çiqasî xerabî bi Kurdan kirine. Di vê biwarê de em karin dabaşa çend bûyeran ji we re pêşkêş bikin:

1) Dema ku êlên Mengolan ji Rojhilat hatin, weke kulî li Rojhilata navîn danîn, li her deverê bû şer û kuştin, sotin û talan, bi taybetî li ser qada Kurdistanê Kurd ji neçarî

Institut kurde de Paris

ji Bexdê ta Ezirbêcanê bûne bendavek, himber wan Berberan rawestiyan, sînga xwe ji tîr û rimên wan re vekirin, ew jî ne ji bo ku welatê xwe biparêzin, lê belê ji bo paytexta Xelîfê islamê "Bexda" biparêzin, ji bo derbas nebin welatê islamê. Di wê demê de gelek qehremanên Kurdan hatin kuştin, bi hezaran gundên wan hatin sotin, wêran kirin, mîrnişîn û dewletên Kurdan, yên serbixwe û aza herifîn, weke: Dewleta Merwanî, Biweyhî û Şeddadî. Sedem jî ew bû ku Kurdan pişta islamê û Xelîfê islamê bernedan, û serê xwe ji wan Berberan re dananîn.

2) Dema ku Yûsif ê Eyûbî yê Rewadî impiratoriyeke islamî damezirand, bi saya zend û bendên lehengên Kurdan Qudsa pîroz aza kir, ew heft Impiratoriyên Ewropî pîs kirin, ew bê rûmet kirin, ta îro Inglîz wê kînê bi me re dikşînin. Cwanmêr Selahiddîn ala islamê di bajarê Qudsê de hilda, herdû xîlafetên islamê kirin yek, lê mixabin rojekê neket bala wî ku dewleteke kurdî damezrîne; wî lehengî islam di ser miletê xwe re digirt, lê îro misilman miletê wî weke milet dibînin, û hinek jî dibêjin: Kurd gawir

in, şeytanê mezin in.

3) Kurdan serokatiya xwe, fermandariya xwe û xaka xwe kirin qurbana ola islamê; her birayekî misilman perçek ji welatê xwe jê re kirin diyarî û xelat.. ew kirin xwedan tac û eywan, û xwe kirin navmaliyên wan.

Vêca, himber van qenciyan em dê çîroka çimekî ji xerabiyên ku misilmanan bi Kurdan kirine diyar bikin:

**1-** Misilmanan gund û bajarên me wêran kirin, bi hezaran ji miletê me zindî binax kirin, bi dehan gundên me bumbebaran kirin, deh hezar bi kîmyayê sotin, dused hezar Kurd nemendî kirin, bi milyonan Kurd koçber kirin, bi çol û çiya xistin, ta ku ew ên –ku em ji wan re dibêjin "Gavir"- ew vegerandin; bi cih û war kirin. Papa yê pîroz û bi rûmet ji wan koçberan re nimêj kir. Lê Kurdino! Hovino! Misilmanino! Zanibin ku şêxekî yan melayekî misilman di cîhanê de, ne nimêj û ne lava ji bo me nekir, ew karên pîs û guneh qedexe nekir. (Ji bilî sofiyekî ji Qamişlo, wê çaxa ku dîmenên zarokên tazî û birçî di nav berfê de dîtin, rabû riha xwe birrî û avêt tifika êgir).

**2-** Birayên me yên misilman –nemaze yên



Institut kurde de Paris

ku ola islamê kirine sîstem û yasa di nav xwe de bi kar anîne- wan kevneperest û hovan, bê sînor û bê wijdanî serokê komara Mehabadê li sêdarê xistin, dûvre Simko Axa kuştin, zanyarê hêja Qasimlo kuştin, Şerefkendî kuştin, şoreşa serok Berzanî herifandin û beravêtî kirin. Tewir ew hov û rihgemar vê demê dibêjin: Kurd ne misilmanin û xwîna wan helal e!

**3**- Birayên me yên Tirk, Kurdistana mezin û Bakur dagir kirine, welatê me Kurdan wêran kirine, bi hezaran gund vala kirine, bûne kavil. Ji Kurdan re dibêjin (Qada we qoqê çiya ye) û bi milyonan Kurdên belengaz û bê xwedî koçber bûne, çûne bajarên Tirkan piştkêşiyê dikin, qîzên Axa û maqûlan navmaliyê dikin.

**4**- Li Binxetê; li parçê Kurdistana başûrê biçûk rewşa miletê me kambax û xerab e, ribek milyon ji wan bê nifûs in, ji wan re dibêjin "Hûn biyanin". (Lê hûn ji kîjan devêrê ne, nabêjin)! Ev kes nikarin xaniyan û zevîyan bikirin û ne bifroşin, nikarin ji Sûrî derkevin, nikarin li otêlan xew kin, nikarin xwe li nexweşxanên dewletê derman bikin. Ev riba milyon kes her tişt ji wan re

Institut kurde de Paris

qedexe ye; bazirganî, hilbijartin, karmendî,.. hema tu dikarî bibêjî ku dest û ling girêdayî ne. Bi ser vê rewşê de jî Erebên parêzgeha Reqqayê anîn ser dilê wan, xaka Kurdan ya herî hêja dane wan, û Kurdên reben di bin çavan re li wan dinerin, newêrin di siya wan dayên.

Vêca Kurd ên her çar parçan dikin hawar, dikin care car, tika dikin, lava dikin, qelenê qada xwe dixwazin, lê hinek ji dagirkêrên qada Kurdan dibêjin: Para we şêx û mela û sofî ne. Qelenê qada we nimêj, rojî û mizgeft in, li nik Xwedê tiştek winda nabe, tev nivîsandiye. Lê hemû bi yek dengî dibêjin: Ta ku fermandarê we, dagirkerê xaka we birayên we yê misilman bin qelenê qada we mizgeft û zindan in! Û çîroka min ji we re xweş.

Institut Kurde de Paris

## Herdem Kurd qurban in

### 1) Bûyera yekemîn

Piştî şerê cîhanê yê yekemîn dewleta Osmanî kete rewşeke xirab û nexweş, hêz û arteşên wan ji hev ketin, Xelîfê Osmanî û dewlet ketin bin deynin giran, keys û fersende ji miletên bindestî wan re hat, da xwe ji bin siya Impiratoriya Osmanî derxin, xwe rizgar bikin; weke Ereban, Belqaniyan, û Silaviyan.. dewletên Ewropî ji hatin bi lez û bez qada osmaniyan a bakurê Efrîqya û mîrnişînên Ereben ên Rojhilata navîn, tev Yemen û Hicaz li hev parkirin. Cihûyan jî devê gencînên zêran vekirin, êrîş berdan qada Filistînê. Wan digotin: Xwedê soz bi mere daye ku me vegerîne vê qada pîroz, qada bav û kalan. Wê çaxê Ingilîzam Misir, Urdun û Iraq dagirkirin. Frensa Sûrî û Libnan û Cezair dagirkirin. Di wê tevger û lebata siyasî de, wê keledewa parkirinê de, çend siyasetmedarên Kurd jî xebitîn, karekî giring kirin ji bo damezrandina dewleteke Kurdî. Ewropiyan piştgiriya daxwaz û armanca Kurdan kirin, lewra dixwestin

Institut kurde de Paris

dewleteke Kurdî ava bikin, wê bikin bendavek di navbera xwe û Rûsan de. Di peymana Sîver 1920an de Ewropiyan biryar dan ku dewletek Kurdî çêbikin. Lê mixabin di wê demê de guhertin û bazarin siyasî nû derketin holê, hêvî û armancên Kurdan beravêtî bûn. Ew bazarên nû jî ev bûn:

a) Dewletên Ewropî bi girtina van welatên nû û bi xêr û bêr mijûl bûbûn, dixwestin cihê lingê xwe xweş bikin, doza Kurdan ji wan re ne serekî bû, ne gerek bû.

b) Dewletên Ewropî ketin bin akama serhildana Etaturk, bi herifandina dewleta Osmanî mijûl bûn, Etaturk soz da wan ku destên wan li welatên Ereban berde, wisa jî dijî hatina Cihûyan ne rawestiya û hatina Cihûyan qedexe nekir.

c) Etaturk ji Ewropiyan xwest ku çîroka avakirina dewleteke Kurdî ji serê xwe bavêjin, himber ku ew çi sînorî datînin bila deynin, û bi ser de jî parêzgeha Mûsilê diyarî da Ingilîzan, û ji wan re got: Ma nayê bîra we Selahiddîn pêl serê qiralê we Riçard kir? Ma hûn çawa

Institut kurde de Paris

li vî gelî ewle dibin? Etaturk û hevalên xwe ji Ingilîzan re gotin: Ma ne doh bû şêx û sofiyên Kurdan birayên we yên feleh kuştin, ew koçber kirin.

Ji bo van sedeman, Kurdistan careke din hat serjêkirin û bû qurban; pel û pirtûkên peymana Sîver hatin sotin, perçe, perçe bûn, ew avêtin avrêja bajarê Lozanê sala 1923an.

Institut kurde de Paris

## *2) Bûyera duwemîn*

Piştî şerê cîhanê yê duwemîn, dewleta Îranê qels ket, şikest, kete bin siya artêşa Rûsî ya sor. Wê çaxê Kurd û Azeriyan xebat û têkoşîneke qehremanî kirin, herdiwan dewleta xwe ava kirin, û serokê hêja Qazî Mihemed bû serokê komara Kurdan ya Mehebadê sala 1946an. Dewletek kurdî çêbû ew bû yekemîn dewleta Kurdî di dema nû de, û ya duwemîn piştî dewleta Merwanî ya Farqînê. (helbet di dûv hatina ola misilmantiyê re.).

Lê mixabin careke din bazar li ser serê Kurdan geriyan. Şahê Îranê xwe avête ber lingê Stalîn ê Rûsî û peyman pê re girêda û muhir kir ji bo Stalîn pêncî salî petrola derya Qezwînê bikole û bimije. Wisa jî şahê Behlewî soz da Emerîkana ku ji wan re bibe kole û petrola Îranê ya başûr bi dest wan ve berde. Rabû leşkerê sor ê Rûsî ji Îranê kişiya û Emerîkana jî guhên xwe girtin. Careke din Kurd û komara xwe û Qazî mihemed û hevalên xwe bûne qurban.

Institut kurde de Paris

Leşkerên faris ên hov Komara Mehabadê herifandin û Qazî û hevalên wî li sêdarê xistin. Ax kurdo! Ax kurdo! Deng bixe guhê xwe li vê stiranê guhdarî bike; piştî sê salan ji vê bûyera malwêran, Kurdên Binxetê stirana "Stalînê mezin" digotin û min jî li wan vedigeran, em bûne Komonîst û hevalê dijminê Kurdan yê herî mezin; kujyarê Qazî Mihemed; Stalîn û dibe ku ta îro hinek kurd hene baweriyê bi rêbaz û mezinahiye stalîn tînin.

Institut kurde de Paris

### 3) Bûyera siyemîn

Şoreşa Kurdî ya serok Berzanî xurt bû, hêz û leşkerên Iraqê lawaz bûn, di şerên Pêşmergên qehreman de bê hêvî bûn, ta ku Seddam bi xwe –eşkere got: Sê berik bi me re neman, ku em şerê Berzanî bikin.

Seddam çi kir? Çi kirî û çi firot?

Seddamê hov çû serê xwe ji şahê Îranê re danî. Soz da ku nema dabaşa Erebistanê bîne zimên, û soz da Emerîkana ku tengava Farisan bibe geraca gemiyên wan, û soz da ku berê kaniyên petrolê bide Emerîka û ji wan re got: Ez dê petrola Iraqê bidime we ji bo hûn çekêd leşkerê min nû bikin û ez careke din li şahê Îranê vegerim Erebistan (Ehwaz) jê bistînim.

Careke din Kurd û şoreşa xwe bûne qurban, di sala 1975an de peymana Cezair hate muhrkirin, Şah û Emerîka şoreşa Berzanî beravêtî kirin. Piraniya Ereban û dewletên misilmanan weke, Tirkî, Sûdan, Yemen û serokê şoreşa Filistînî Y.Erefat, hemiyan Seddam nîşan kirin, biryara wî

Institut kurde de Paris

pîroz kirin, û Erefat ji Seddam re got: Aferîn û sed Aferîn, te ev hovêd Kurdan şikandin, te ew betaweta kirin. Heger Kurd serfiraz bibana wê careke din bihatana Quds aza bikirina, em dê li ber lingê hespên wan biketina nav çiravê.

Institut kurde de Paris

## 4) Bûyera çaremîn

Ebû Muslim ê Xurasanî hebû; mêrxas û tundekar, hem jî zana û rêzanê dema xwe bû, hingî bi nav û deng bûbû, ew pesin didan û bi nav dikirin: ***Ebû Muslim ê Xurasanî Iskenderê didiwanî.*** Vî qehremanî dixwest malbata pêxember bi parêze. Û ne hêle Emewiyên bê ol û kujyar, vê binemala pêxember biqelîne. Vî qehremanî leşker û leheng li dor xwe civandin û şerekî bê hedan kir dijî xîlafeta Emewiya ku paytexta wan li Şamê bû. Armanca wî dilpakî ew bû ku malbata pêxember biserkeve û yek ji vê malbatê bibe Xelîfê islamê.

Ebû Muslim, leşkerê Emewiyan şikand. Xelîfê Emewiyan yê dawî Merwan lawê Mihemed; yê ku jê re digotin "Merwanê ker" hingî xure bû –û diya wî Kurd bû- ji ber Ebû Muslim bazda, berê xwe da Misrê. Şandek ji Ebû Muslim re şand jê re got: Xalo! Min nekuje. Binêre, ez taştê me, tu firavînî. Ti caran li bextê misilmsnan ewle nebe. Lê Ebû Muslim bi gotina wî nekir; mêrxas û

Institut kurde de Paris

canfîdayên xwe bi dûv xwarziyê xwe Merwan de şandin ew li Misrê kuştin.

Piştî kuştina Merwan –Xelîfê Emewî yê dawî- Ebû Muslim yek ji malbata pêxember kire Xelîfê islamê –ew jî bi navê Ebû el Ebbas bû- wê çaxê Ebû Muslim ê Kurdî yê Xurasanî xîlafeta Ebbsî çesipand û paytexta xîlafetê bire Bexda.

Kurdino! Dînino! Çavê xwe belkin, guhê xwe vekin, û bibhîzin çi bi serê Ebû Muslim hat: Xelîfê islamê Xelîfê Ebbsî El`Mensûr, bi fen û fûtan, bi şalozî û ziman-xweşî, Ebû Muslim anî dîwanxana xwe, ew da ber şûran. Her Ebû Muslim jê re digot: Min ji dijminên xwe re bihêle. Wî bersiv dida digot: Ma ne dijminê min ê mezin tu wî.

Kurdno! Li bextê xelîfê islamê binerin û xwe nas bikin û zanibin ku herdem hûn qurban in.

Institut kurde de Paris

## Selman ê Farisî

Di baweriya min de Selman Kurd bû, ne Farisî bû, ji ber ku ew li Medain (Teysefûn) bû, ew bajar paytexta Sasaniyan bû; nêzî Bexda îro bû. Sasanî bi xwe ji malbatek Kurd bûn, lê bi navê farisan têne jimartin, ji lewre Kurd û Faris ji yek nijadî ne, û Impiratoriya Sasanî demeke dirêj fermandarî li Îranê ji kiriye.

Di vê biwarê de ez dê çîrokeke kurt ji we re bibêjim da baweriya we bînim ku Sasanî Kurd in:

Çaxê ku Erdeşêr qiralê Sasanî yê yekemîn Tac li ser serê xwe danî, qiralê devera Îranê yê bi navê Erdewan nameyek jê re şand, eve naveroka wê: «Kurdo! Kê ji te re gotiye û bexişandiye ku tu tacê li ser serê xwe deynî?». Lê Erdeşêr bi ser nameya wî de mîz kir, ew di şer de şikand û Erdewan kuşt û ew ma qiral û Teysefûn kire Paytext ji dewleta Sasanî re û ola Zeredeşt di fermandariya xwe de bi kar anî; kir ola dewletê, zanyar û oldarên zeredeştiyan kirin



Institut kurde de Paris

pende-yarên xwe û yasakarê wê. Ola pêxember Îsa jî li nav Kurdan belav bûbû – bi taybetî Kurd ên çiyayê Toros û Amed û Urfayê- gelek ji wan derbasî vê olê bûn û ola Zeredeşt berdan, lê qiralên sasaniyan bi hezaran ji miletê xwe yên bawerî bi ola Îsa anîbûn dikuştin, ew jî bi handêrkirina zanyar û mûbedan (şêxên zeredeştî) di wê xirecir û kefteleft û cireya navbera ola Zeredeşt û ola Îsa de zanyarekî hêja û dûrbîn li bajarê Medain hebû, navê wî Selman bû, Selmanê Kurd (çiku faris li Medain tunebûn) bihîst ku ola felehan gihaye bajarê Nisêbînê, rabû berê xwe da wir (ew bê jin bû) û du salan li kenîsa Nisêbînê pirtûk û pendên felehan xwendin, û bawerî bi ola pêxember Îsa anî. Piştî mana du salan li wir Metranê Nisêbînê ew şand Mekê, ji bo alîkariya felehên derdora Hicazê bike. Di riya çûnê de êlek Ereban ew girtin û ji xwe re kirin kole. Lê dema ku keşê Mekê bihîst rabû pere danehev û çû ew ji wê êla Ereb kirî, ew aza kir.

Selman kete bin siya Werqa kurê Newfel – keşayê Mekê- wî jî ew kire navmalî û alîkar ji Mûhemmed re (lê selmanî dibêjin ew kire

mamostayê Mûhemmed ew hînî ola Îsa dikir, û piştî ku jina Mûhemmed "Xedîce" mir û amê wê Werqa jî mir, keys ji Mûhemmed re hat û bi alîkariya Selman ola islamê eşkere kir û yasa anîna çar jinan çesipand).

Selman ê "Farisî" pişta Mûhemmed berneda. Di şerê "Xendeqê" de misilman bi saya Selman biserketin û dijminên xwe şikandin. Selman stûna ola islamê bû; ew Ereb ên hov û zikreş li hev radigirtin, kar û xebateke bê hedan ji vê ola nûre kir. Mûhemmed xurt kir, ew li ber dilên Qureyşiyan şêrîn kir. Mûhemmed bi xwe gavek bêyî Selman nedavêt û her dem ji misilmanan re digot: «Selman ji me ye; ji malbatê ye».

Piştî Mûhemmed mir, termê wî sê rojan di mizgeftê de li erdê ma. Hinga Qureyşî bi nîşankirina Xelîfe mijûl bûbûn, selman jî wan hersê rojan xwarin nexwar; serê xwe ji nav çaqên xwe ranekir.

Piştî mirina hevalê xwe gelek tan û niç dibihîstin, gelekan sixêf jê re didan. Hinekan digotin: Ev kesê Mecûsî li vir çi dike? Hinekan digotin: Ev zilamê farisî yê bê

Institut kurde de Paris

xwedî wê li ku bixwe? Wê li ku xew ke, nema çêdibe di mala pêxember de bimîne? Hinekan jê re gotin: ya baş ewe tu vegerî welatê xwe. Dijberên te hene, û fersende ji wan re bê wê te bikujin û kes tuneye te veşêre.

Rabû Selman berê xwe da bakurê xwîniyan û vegeriya bajarê Medainê; warê bav û kalan, û li nav malbata xwe bi dilovaniya Xwedê şabû, û gotina bapîran bi cih anî ya ku dibêje: «Mirov bê Xweda dibe, lê bê xwedî nabe».

Institut kurde de Paris

# Fewzî Silo

Sala 1983an, ez li bajarê Şamê me. Min weke her car, li ûtêla Sufera xew dikir. Hevalekî min heye, ji Kurd ên Şamê, ji mala Alûsî ye. Belê ew hevalê bi rûmet, bi temenê xwe ji min mezintir e, lê belê em bi serê hev sûnd dixwin; em himkûfî hevin, taybetî û sincin hene me nêzîkî hev dikin; yek jê ewe ku ez û ew herdû berê di partiya komonistan de bûn, ya din min û wî weke hev hij vexwarina meyê dikir.

Çawa min telefonî hevalê xwe Ehmed Alûsî kir, min dît ew û hevalekî din –navê wî Hisên Hesen– bi lez hatin ûtêlê. Me hev maçkir. Me li hev pirsî. Em bi hev şabûn. Me qawe vexwar. Piştre em ji nişkan ve ketin dabaşa Kurd ên Şamê; êlên wan, malbatên wan, maqûl û mezinên wan, cih û warên ku jê hatine, kî ji wan qence û kî xerabe? Kî maye Kurd, û kî winda bûye? Kî bi kurdî dizane, û kê jibîr kiriye?.

Institut kurde de Paris

Hevalê min Ehmed ji min re got: Ez dê îro qenciyeke mezin bi te bikim. De hema rabin em hersê herin serdana Elî Axa Bozo; şalyarê Sûrî yê kevnar, vaye li ûtêla Ûmeya rûniştiye. Ew jî acize û hizyarê gengeşe û hevpeyvînê ye. Ew van mijaran ji her kesî bihtir dizane; çiku ev şalyar ji Kurd ên Şamê yên herî kevn e. Bi xwedê mamoste wê Elî Beg kela dilê te hênik bike.

Bi rastî, ez jî hinga hizyar û evîndarê van rûniştinan me, ez ji mêj ve dixwazim yekî wilo bibînim, bê dudilî min gote wan: Rabin da em herin nik Elî Bozo! Û min ji wan re berdewam kir: Û piştî em vegerin, ez dê maseke meyê weke ya mîrê Botan ji we re vekim.

Ehmed Alûsî, ciwamêr yek nekir dido, em birin ûtêla Ûmeya; ya ta îro li Şamê bi navûdenge. Em derbas bûn oda Elî beg; şalyarê bi rûmet, ew kesê zana û bîrewer rabû pêşwaziyeke germ ji me re kir. Derbas bû oda razanê, taximê razanê guhert û ji nû ve hat bi me re rûnişt. Bi kêf û şadî li rewşa me pirsî. Ehmed bi lez em bi hev dan naskirin, bi zimanê Erebî pê re peyivî, lê wî şalyarê hêja ji Ehmed re got: Tu dibêjî

Institut kurde de Paris

mamoste Abbas ji Kurd ên Qamişlo ye, û ez dizanim ciwamêran zimanê xwe parastine, û ji me çêtirin, de bihêle, Ehmed, ez û mamoste qasekî bi zimanê dê û bavan bi hev re gengeşê bikin.

Elî beg Bozo ji min re got: Ez çar caran bûme şalyarê Sûrî, malbata min ji Amedê (Diyarbekir) hatiye Şamê, lê diya min digot: Ez ji Bingolê me. Gelekî dixwest rojekê here Bingolê, merivên xwe bibîne, lê rebenê ew hisret pê re çû gorê. Elî Beg digot: Di dema Osmaniyan de em û çend malbatên Kurd ên bi navûdeng hatin Şamê; me kerwanên hecacên mala Xwedê diparastin, me rêberiya wan dikir, ew ji Durziyên riya Hecê diparastin, ji ber ku ew kerwanên ku Kurdan ew dibirin Hecê, kesî newêrîbû riya wan bigire, yan wan bişelîne. Wî digot: ew malbat jî evin; Mala Bozo, mala Şemdîn, mala Zerekî, mala Alûsî, mala Kurd Elî, malbata Alereşî, malbata Ezmê..ûhd. di navhev peyvînê re ji min pirsî: Ma zimanê min û zarê min ê kurdî ne xweşe? Min got: Belê, bi Xwedê pir zelal û petî ye.

Piştî derfet da min, min jî ev pirs jê kir: Şalyarê rêzdar! Ez bawerim me Kurdan –bi

saya yên weke we- dewleta Sûrî azakir û me jê re yasa û destûr danî. Yekemîn serok komar Elî Abid bû sala 1932an, bi dûv re Mihsin Berazî, Edîb Çîçeklî, Hisnî Ze`îm, Rişdî Kîxya, Reşad Bermeda, Tewfîq Nîzamiddîn, Fewzî Silo û...û..ûhd, we dewleta Sûrî rakir ser lingan. Ma ka gelo we ji me re çi kir?

Bersiva Elî Bozo ev bû: Birazî em Kurd tim ji xelkê re dixebitin, em kole û navmaliyên misilmanan e. Biraziyê delal, dagirkerê Frensî ji Kurdan ditirsiya û her dever dagir kiribû ji bilî taxa me Kurdan ya li Şamê.

Frensa ji Kurdan re got: Emê dewletek Kurdî ji we re çêkin. Lê lîder, beg, axa, şêx û melên Kurdan digotin: Em birayên xwe yên Ereb ên misilman bernadin. Birazî! Derdê me Kurdan girane, de bihêle ez ji we re vê çîrokê bibêjim û heger tu karibî dûvre binivîsî pir başe. Min got: Fermo begê min bibêje.

Elî beg Bozo got:

Birazî! Ez şalyarê hundir bûm di dewleta Fewzî Silo de, Reşîd Kîxya şalyarê çandiniyê bû (Fewzî Silo ji êla Milan bû. Mala Kîxya

Institut kurde de Paris

Axa yên dora Idlib bûn). Sala 1952an me şandek bi seroktiya Fewzî Silo –serokê dewletê- amade kir, beriya şoreşa Cemal Ebdinnasir bi hindikî. Em li balafirê siwar bûn û me berê xwe da Misrê, ji bo ku em têkiliyên xwe yên abûrî, siyasî, û çandî bi Misrê re xurt bikin.

Birazî! Wê çaxê qiralê Misrê Farûq bû. Ew ji malbata Xidêwiyan bû, ew jî Kurd bûn ji Amedê bûn. Xidêwî Farûq (melek Farûq) bi vexwarina meyê û laqirdiyên qîzikan daketibû, hayê wî ji serokatiya Misrê tunebû, lê serokwezîrê wî Mistefa Paşa Nehhas zîrek û zana bû, wî fermandariya Misrê dikir. Vêca gava em gihiştin Misrê, Mistefa pêşwaziya me kir. Em derbas kirin qesra Melek Farûq, cihê serokan. Ew li ser sendelekî wisa li xwe dizîvirî rûnişt û em li dorê rûniştin, lê Xwedê zane, qelafet û gewdê wî bi qasî yê me hersiyan hebû. Em mabûn li hêviya ku ew guftûgoyê veke. Ciwamêr xêrhatin û silavin bi rûmet li me kirin, û berê xwe da serok Fewzî û bi tinazî jê pirsî: «Êh ya sî Fewzî(bi zarê misrî ), Fewzî fehimnah, Silo de êhh?:

«إيه يا سي فوزي. فوزي فهمناه. سلو ده إيه؟». Ango:

Me Fewzî naskir, vêca Silo çiye?

Em bi xwe ji vê pirsê veciniqîn û hinekî ingirîn, lê Fewzî Silo weke mêran jê re got: Silo bi zimanê Kurdî şêrînbûne, delalîbûne, ji Silêman e. Kirpîn ji Mistefa Paşa ne hat, lê neçar zîvirî ser min, hema min bê dudilî got: Ez Elî Bozo me, şalyarê Sûrî yê hundir im, wisa jî zîvirî ser Rişdî Kîxya, wî jî bi hêrz got: Ez Rişdî Kîxya me, şalyarê çandiniyê me. Mistefa Paşa hinekî ponijî û naskir ku em herdê Kurd in û em hinekî ingirîne. Rabû beşişî. Ji me re peyivî, berevanî di ber qiral Farûq de kir. Pesnê dewleta Misrê da, wî got: Ma ne bav û kalên qiral Farûq derya Sipî û ya Sor gihandin hev, û îro ev tengav bi milyonan zîv û zêr ji Misrê re tîne. Me jî xweşkir û da nasîn ku Misrê diya welatên Erebaye, divê têkiliyên me bi hev re xweş bin û em rabûn. Li vegerê Fewzî Silo ji me re got: Ev çima we bi zirt navê xwe hildan? Rabû min jê re got: Serokê min! Wê ji min re bigota: Elî me nas kir ev Bozo çiye? Diviya bû ez bêjim: Bozo bi zimanê kurdî sipiyê beloq e. Û wê ji Rişdî re jî bigota: ev Kîxya çiye? Diviya bû ew jî bêje: Kîxya nîv Axa ye, yan jî pendeyarê Axê ye. Heye bigota jî:



Institut kurde de Paris

Xuyaye dewleta Sûrî îro ya Kurdye!.

Min keys jê anî û pirsek bi zîrekî jê kir: Begê min! Hûn di balafirê de bi çi zimanî bi hev re dipeyivîn?

Ciwamêr got: Weleh ev pirsa te giring bû. Bi rastî em bi zimanê erebî dipeyivîn, lê me bi kurdî sixêf dikirin, hema weke nimûne: Çaxa Fewzî ji min re got: Te çima bi hêrz li Paşa vegerand? Min got: wî segbavî dixwest tinaz û qeşmeriyê xwe bi me bike.

Institut kurde de Paris

# Şêxê Şêxan

Beyanî sibeha Înê şêxê riya (rêbaza) Neqişbendiyan ji xew rabû. Nimêj kir. Ji mizgeftê derket çû li ser lateke mezin û teyisandî –li pêşiya mizgefta Xinûsê- rûnişt û ponijî, li çiyayê bakur nerî, berê xwe da Amedê, ramanên wî li hev ketin, bi hev re ketin miçûrgê, hişê wî hinekî çelqiya, lê hate bîra wî çaxê ku feqe bû melayê bavê wî herdem jê re digot: Tê bibî şêxê şêxan, yan jî bibî fenera şêx û melan!

Ramanên şêxê Palo Şêx Se`îdê kurê Şêx Mehmûd neviyê Şêx Elî yê Sebnenê (gundek nêzîkî Amedê ye) wê sibehê di serê wî de dileyistin; ne ditebitîn, ne dihedinîn gewdê wî jî her bîstikekê hêrz dibû, diierizî. Neçare rabû xwe berda nav werzê mizgeftê. Çend sofiyan ew dîtin. Qulûz qulûz, xwe nêzî wî kirin, lê Şêx ji wan xwest ku vegerin mizgeftê û wî bi tenê bihêlin. Wê sibehê ev Şêxê xort û xurt bi xwe re dipeyivî, ji xwe re digot: Ma çima dewletek vî miletê perîşan û

Institut kurde de Paris

reben tune ye? Ma çima Tirk û Ereb û Farisan ji xwe re dewlet avakirine, bi zimanê xwe fermandariyê dikin? Ma çima Faris û Tirk zimanê Qur`anê bikar nayînin? Ma çima Efgan û Pakistan û..û hemû xwedî keyan in û Kurd tenê bindest û bê xwedî ne? Lê, bê gomane, ne dihate bîra wî ku miletê Kurd dibêje: Mizgeft mala min e. Mizgeft welatê min e. Çûna mala Xwedê armanc û daxwaza min e. (wisa dijmin ev simbol di serê Kurdan de çandiye).

Şêxê hêja û bi namûs, ne dihate bîra wî ku ev miletê kevneperest, olperest, êlperest di xew de ye, kevnika ola islamê girtiye ser mejiyê wî, ser çavê wî. Ji roja ku ola Zeredeşt berdaye û bi ola islamê girtiye "birayên" wî yên misilman ew ji vê olê re kirine kole, ew ne kirine xwediyê wê, her û her wî şermezar dikin, wî pesindar dikin dibêjin: Hûn Kurd kur û neviyên Şeytan in!

Şêx Se`îdê hêja û qehreman mezin bû, kete rêza şêxên mezin û nav û dengê wî li cîhanê belav bû. têkiliyên wî bi Kurd ên miletperwer re xurt bûn, û çaxa Xalid Cebrî –Serokê komîta rizgarkirina Kurdistanê- hate girtin, endamên komîtê Şêx Se`îd

pejirandin; ew kirin serokê komîtê û dest bi kar û xebata giran û pîroz kir.

Şêx Se`îd û hevalên xwe yên komîtê û yên ji derveyê komîtê, li hev diciviyan, bi hinek şêx û mele û Axan re rûdiniştin, pîlan û program ji şoreşekê re datanîn. Dewletê jî şopa wan dipeland, çavnêrî li wan û tevgera wan dikir. Gelek xiniz û olfiroş berdan nav wan ta ku şoreşê di destpêkê de beravêtî bikin.

Şêx Se`îd û hevalên xwe Mûsa begê Motikî, Yûsif Zeya yê Bedlîsî, Xalid Axa yê Hesenî, Xalid begê Cebrî, û Umer ê Faro negihiştibûn ku pîlana dawî ji şoreşê re deynin, hîn di nîvê rê de bûn dewletê ew kişandin şer.

Pêwîste ku ez çîroka destpêka şoreşê –li gor min xwendiye- ji we re bibêjim:

Şêx Se`îd û hevalêd xwe biryarek bi dizî di nav xwe de dan, ji bo ku şoreşê di 21 Avdarê –roja Newrozê- de li darxin. Yûsif Zeya karekî bê hedan û bê hempa li welêt û li Stenbolê dikir. Wisa jî Elî Riza –lawê Şêx Se`îd- çû Amedê, Paşa û mezinên Kurdan dîtin. Çû Sûrî serokê zana û xanedan dîtin. Elî Riza çû Stenbolê, ew Kurd ê zana û bi

Institut kurde de Paris

navûdeng Seyid Ebdilqadir dît. Bi hev re şert û mercên şoreşê danîn. Seyid Ebdilqadir xwest ku rengê şoreşê olî be; li gor mejiyê Kurdan be.

Di vê tevger û lebatê de dewletê Xalid Cebrî û Yûsif Zeya girtin, ew birin Bedlîsê dadgeha leşkerî. Pişt re Mûsa begê Motikî jî girtin. Piştî girtina Xalid Cebrî, Şêx Se`îd kirin serokê komîta rizgarkirina Kurdistanê. Piştî girtina Mûsa begê bi demeke kurt Şêx Se`îd jî –weke şahid xwestin dadgehê, lê Şêx pîlan û daxwaza dewletê naskir, neçû dadgehê, xwe nexist nav lepê wan.

Di roja 5ê Sibatê de Şêx Se`îd çû gundê Pîran, nik birayê xwe Ebdirrehîm. Şêxê hêja û sed qehreman payayên cengê bûne mêvanê gundê Pîran û şêx Ebdirrehîm.

Lîderên Tirkan di wê demê de gelek xiniz û Kurd ên bê wijdan peyda kiribûn. Wan teresan çavnêrî û pêwanî li tevgera Şêx dikirin û her roj nûçeyên vê tevgerê ji lîderên Tirkan re dişandin. Dibêjin roja Şêx Se`îd û hevalên xwe gihan Pîran kewteke leşkerê Tirkan bi serokatiya mûlazim Hisnî û şûngirê wî Mistefa Asim, ew jî gihan Pîran. Ji Şêx Se`îd û birayê wî xwestin û gotin: deh

Institut kurde de Paris

Kurd ên gunehkar û kujyar li gundê Pîran hene, li mala yekî ne navê wî Behrî ye. Şêx Se`îd ji wan re got: Divê hûn nêzîkî van kesan nebin. Hûn îro mêvanin weke min. Lê piştî ez herim Kincê hûn dikarin wan bigirin.

Wisa Şêx xwe ji wan dipelikand. Naskir ku ev pîlana dewletê ye, ji bo ku şer zûzû vêxin û şoreşê beravêtî bikin. Mûlazim Hisnî gotina Şêx Se`îd li erdê xist û bi xurtî hewil da ku here mala Behrî bipelîne, lê kanî ew Kurdê ku xwe bigire, ew Kurdê ku xwe çi bêl bike! Ew Kurdê ku bibîne leşkerê Tirk derbasî mala kurdekî bibin, evqas lehengên Şêx û gundiyên mêrxas, wê çawa bihêlin mûlazimek û çend nefer pêl hirmeta mala yekî gundî bikin? Rabûn di şerekî biçûk de çend leşker kuştin û yên dî dîl kirin; ew bê çek kirin, ew girêdan û avêtin xaniyekî gemarî.

Şêx Se`îd bi xwe berê xwe da Kincê, xwe nebihîstî kir, xwest ku ev agir vemire, deng pê nekeve û belav nebe. Lê çawa şêx Tahir – birayê Şêx Se`îd- ev çîrok bihîst wî jî êrîşî postexana Licê kir, ew dagir kir. Belgeyên dewletê û malê wê birin ji Şêx Se`îd re. Şêx



Institut kurde de Paris

Tahir û dused peyayên cengê pê re li Kincê gihane Şêx Se`îd.

Wê çaxê Şêxê bi navûdeng naskir ku şoreşê destpêkir û neçare divê defa hewarê lêxe.

Di 14ê Sibata 1925an de Şêx Se`îd bi hesanî bajarê Kincê girt û parêzerê wê dîlkir, û Feqe Hesan –serokê êla Modan– kire parêzerê Kincê, û ferman derxist bajarê Kincê kire paytexta Kurdistanê ta ku Amedê bistîne; ji bin destê Tirkan derxe. Ji wê demê ve Şêx bû serokê leşkerê azadiya Kurdistanê. Wisa jî fermanek derxist digot: her kesê beşdariyê di şoreşê de bike ew tekoşere di riya ola islamê de. Fermaneke din derxist ku baca dewleta Tirko ne na here Stenbolê, divê bêş û bacên miletê Kurd herin Kincê bikevin destê Şêx Se`îd û karbidestên wî; ango di vê biwarê de em dikarin bibêjin ku Şêx Se`îd di 14ê Sibata 1925an de dewleteke Kurdî avakir û berdewamkir ta dawiya Avdarê, yan ta destpêka nîsanê sala 1925.

### *Çûna ser Amedê*

Şêx Se`îd û pendeyarên xwe bawer kirin



Institut kurde de Paris

ku Amedê bigrin wê karibin bingeha dewletek kurdî mezin deynin, û Amedê bikin paytexta Kurdistanek serbixwe. Şêx û hevalên xwe biryar dan ku berê xwe bidin Amedê.

Di nîvê meha Sibatê de, bi serokatiya Şêx Se`îd, hêzên Hecî Hesen û Umerê Faro, û wisa jî êlên Mestan û Botan ên başûrê Coya Kicora pê re kar bûn, di bîstê Sibatê de –van hêzên Kurd- Licê û Xanê girtin. Wê çaxê Salih begê Xanê û peyayên xwe tevlî leşkerê Şêx bûn. Leşkerên Kurd di newala Xanê re ber bi Amedê ve kişiyan. Nêzîkî bajêr pêrgî leşkerên hevalê xwe şêx Şemsiddîn bûn, û van hêz û leşkeran ji aliyê bakur ve Amedê dorpêç kirin. Aliyê Palo û Xarpêtê jî "Alahî Qumandan" şêx Şerîf sparte xwe, aliyê Varto jî Baba begê Evdille Melekan spartin xwe, wisa jî Elî Riza –lawê Şêx Se`îd- û Xelîlê Xeto pêre hêzên xwe kirin weke bendavekî li pêşiya leşkerên Tirko, qene ji aliyê Rojava û Bakur ve derbasî Amedê nebin, û bi hana leşkerên Tirko ve neyên, û xwarin û çekan ji wan re neyînin, ji aliyê Rojhilatî Amedê ve leşkerê Heqî begê licî eniya şer sparte xwe, ji aliyê Rojhilatî Rojavayî çemê Diclê leşkerê

qehreman Umerê Faro eniya şer girt û sparte xwe, ev herdû hêzên Kurdan himberî leqê heftan ê Tirkan rawestî bûn, ji aliyê riya Paxir Ma`denê leşkerê şêx Ebdirrehîm – birayê Şêx Se`îd- Amed dorpêç kiribû.

Ji aliyê riya Silîva jî leşkerê şêx Şemsiddîn Amed dorpêç kiribû. Divê bê gotin ku êla şêxê Doda jî bi şêx Şemsiddîn re bû, wisa jî êlên Silîvan û Sînan bi wan re beşdar bûbûn.

Di wê çaxa ku Amedê ji her çar semtan ve hatibû dorpêçkirin, Walî yê Amedê Elî Cemal ê Mêrdasî bû, û serok leşkerê Tirkan Orbayî Kazim Paşa bû. Van lîderên zana dergehên Amedê girtibûn, bendewarê alîkariyê bûn. Leşkerê Şêx û qehremanên Kurdan hewil didan ku dergehekî ji yên Amedê vekin û tekoşer derbasbin. Hevalên wan di bajêr de hebûn, lê mixabin bê çek bûn. Di vê tevger û lamûfekê de xortekî zîrek bi navê Mihê Helê rêçikek di dergehê Bedenê, yê aliyê Mêrdînê de, vekir û nêzîkî sed qehreman û canfida pêre ketin bajêr. Dibêjin Melayekî miletperwer ew dîtin, derket jora minara mizgeftê û got: "Ellahû ekber". Wisa gelek ji hevalên hindirê bajêr jî



Institut kurde de Paris

beşdarî di şer de kirin, lê mixabin leşkerên Tirk karê xwe ji vê bûyerê re kiribûn, û di vî şerî de 150 sed û pêncî leşkerên Şêx şehîd ketin, û dergehê Bedenê careke din hate girtin. (Derbasbûna bajêr di deriyê Mêrdînê re di 10ê Avdara 1925an debû).

Piştî ku Şêx Se`îd û hevalên xwe bê hêvî man, naskirin ku ew nikarin Amedê rîzgar bikin, hate zanîn ku 40 hezar leşkerên Tirk ji Bakur ve û 30 hezar leşkerên çekdar û bi rêkûpêk ji Başûr ve tên hana leşkerên hundirê bajêr.

Şêx û hevalan biryar dan ku ji ser Amedê vegerin, çêtire ku bi hezaran ji miletê wan bêne kuştin. Di yekê meha Nîsanê de leşkerên Şêx bi serokatiya wî berê xwe dane Palo, dûvre çûne Selxan.. lê her artêşa Tirk li dûv wan diçû, û rê li wan teng dikir.

Di dawiya Avdarê de Xalid Hesenî, Elî Riza, û Xalid Cebrî, bi hezar peyayî ve, berê xwe dane Îran, û li ser sînorê Îranê şerek çêbû di navbera şoreşgeran û êla Heyderan bi alîkariya farisan. Di wî şerî de şêx Abbas kurê Şêx Se`îd û Şemsiddîn kurê Xalid begê Hesenî weha jî Kerem Axa serokê êla Zerekan şehîd ketin. Û hinek ji wan

Institut Kurde de Paris

şoreşgêran jî gihane cem Simko; serokê êla Şikaka.

Piştî ku leşkerê Şêx ji hev ket, dijmin lê pir bûn, her çend hêz bi cihekî ve çûn. Artêşa Tirk Şêx û hevalên wî di newala Kincê de dorpêç kirin. Di nîvê Nîsanê de Şêx Se`îd, şêx Ebdillae, şêx Xalib, şêx Elî, Reşîd Axa, Mihemed Axa, Teymûr Axa û gelek şoreşger bi wan re girtin, ew birin Amedê.

Piştî dîlkirina Şêx Se`îd û hevalên wî, di 14 Gulanê de dadgeha mirinê û sêdarê dergehê xwe vekir û dest bi dadkirina leşkerî û bê yasa kir. Di 27ê Gulanê de dadyarê leşkerî ev qehremanên hêja; Seyid Ebdilqadir û kurê wî Mihemed, Hacî Axtî (avokat), Kor Sûadî, rojnamevan Kemal Fewzî, û Xoce Eskerî li sêdarê xistin. Berî sêdarkirinê avokat Hacî got: «Bijî Kurdistan». Wisa jî Seyid Ebdilqadir got: «Ez bi hêvî me cangoriya min bibe rizgariya Kurdan.». Ji 14ê Gulanê ve Tirko dest bi kuştin û sêdarkirina Kurdan kir. Di 30ê Gulanê de 47 kes bi Şêx Se`îd re –li Amedê- sêdar kirin, û wisa rûpela dawî ji çîroka şoreşa wî lehengî hate tewandin.

Lê ez dikarim nerîna xwe û rexnên xwe di

Institut kurde de Paris

biwara vê şoreşê de bibêjim û binivi sim

1) Sedema serekî di herifandina şoreşa Şêx de destpêka wê ya bi lez û zû bû. Ne di çaxê xwe de dest pê kir.
2) Şoreşgeran bîr ne birin ku riya tirênê bigirin, da leşkerên Tirk nikaribin ji Rojava bihata Rojhilat.
3) Leşkerên Şêx Se`îd şêx û Axa bûn, sîstema leşkerî û şer nizanîbûn.
4) Gelek malbatên Kurdan, bi leşkerê Tirkan re –dijî şoreşê- şer dikirin.
5) Êlên Kurdan ên Elewî û Elî-îlahî, ji ber curre û dijberiya olî, alîkarî bi şoreşa Şêx Se`îd re nekirin.
6) Gelek şêx û mele dijî Şêx rawestiyan, çiku di baweriya wan de ku wê Şêx Se`îd rêbaza Neqişbendî xurt bike, fereh bike û wê misilmanan birûxîne û bixe bin siya Neqişbendiyan.
7) Şêx û hevalên xwe têkilî bi dijminên Tirkan nekirin û alîkarî ji Rûsan, Îraniyan û Ermeniyan ne xwestin.
8) Çek û alavên şer yên leşkerên Şêx kevn û hindik bûn.
9) Şoreşa Şêx Se`îd di demekê de dest pê kir, ew dema ku Kurd di tariyê, dijberiyê



Institut kurde de Paris

û olperestiyê de newq bûbûn; xwendevan tune bûn, zanayên Kurdan şêx û mele bûn; ew jî sed partî bûn, piraniya wan jî ewlekarî û xinizî ji dewletê re dikirin.

Institut kurde de Paris

## Kurd yekemînin û li paşmayî ne

Kurd yekemîn kes ên ku hesp kedî kirin, yekemîn kes ên ku genim çandin. Li gor bermayên kevnar ên ku di şikefta Hoto û Şanîdar de –li Bakurî Silêmaniyê- hatin dîtin, û zanistên kevneşopan dibêjin: dibe ku ev şikeft cîwarê insanê pêşî be, û yekemîn be.

### Nevertîtî

Bê gomane ew gelê kevnar û bi navûdeng; yê bi navê Hûrî-Mîtanî bav û kalên Kurdan e, paytexta wê Impiratoriyê bajarê Gozana bû. Ew kevne bajar îro dikeve başûrî Serê kaniyê; li ser şaxê çemê Xabûr ê ku ji Serxetê dadikeve, hatibû avakirin. Di dema îro de jê re dibêjin "Tel Helef". Qiralên Hûrî-Mîtanî û Fir`ewnên misrî pirê caran dijiîtiya hev dikirin, wisa jî gelek caran li hev dihatin. Di peymaneke lihevhatinê de herdû Impiratoriyan xwestin bibin mirovên hev; jinan ji hev bînin qena aştî û xweşî di



Institut kurde de Paris

navbera wan de dewam bike, rabû Qiralê Mîtaniyan keça xwe Nevertîtî da Fir`ewnê Misrê. Dawî ew jî yekemîn jin li Misrê bû Fir`ewn; ango: jineke Kurd bû Fir`ewneke mezin û ta îro bi nav û denge.

### *Keşta Nûh*

Kurdan bi saya çiyayê xwe «Cûdî» insan ji qelandinê parastin. Wî çiyayê pîroz keşta Nûh pêxember li ser baskê xwe lûsand, piştî lehiya mezin rawestiya, ew jin û mêr, ew lawir û tilûr hemû zindî riha bûn û li cîhanê belav bûn.

### *Selahiddîn*

Yekemîn lîderê misilmanan herdû peyrewên (xelîfê) islamê kirin yek; peyrewê Fatimî li Misrê bû, û peyrewê Ebbasî li Bexdê bû. Wî qehremanê Kurd Yûsif kurê Şadî kurê Eyûb herdû kirin yek; ew qehremanê bi navnîşanê Selahiddîn bû, ew lehengê Kurd –ji êla Rewadî, ji kurdên Ezerbêcanê bû– wî cara yekemîn Qudsa pîroz ji destê xaçparêzan derxist.

Institut kurde de Paris

Lê mixabin ew qenciyên ku Selahiddîn ji islamê re kirin, bi xirabî li miletê Kurd vegeriyan. Ji lewra Elewî dibêjin: Çima Selahiddîn xelîfê Fatimî talan kir, ew ji ser sendelê xîlafetê rakir û çima xîlafet radestî Ebbasiyan kir.

Ewropî jî di peymana Lozan de dijî Kurdan rawestîn; ji hev re digotin: Ev Kurd çêliyên Selahiddîn in, ên ku xaçperest tev qûnrim kirin; ew Yûsifê Kurd; ê ku pêl serê lehengên me dikir. Heger ev Kurd –neviyên Selahiddîn- destên wan dar bigire, û bibin dewlet û xwedî hêz, wê me Ewropiyan ji Rojhilata navîn derxin, wê me ji xêra Rojhilat û Petrola wê bê par bikin.

Ji loma Ewropî dijî armanc û xwestekên Kurdan dibin bendav, ji hev re dibêjin: Ev Kurd bi ola islamê ve girêdayî ne, xwe ji stûna islamê bernadin, divê em wan bindest û kole bihêlin, û em nehêlin ew serê xwe rakin.

## *Kê tengava Siwês çêkir*

Bê gomane, Mihemed Elî Paşa ji kurdên Amedê bû. Osmaniyan ew kirin serokê

Institut kurde de Paris

Elbanya, ew dewleta Ewropî ya ku di bin destê Osmaniyan de bû. Wî Paşa yê payebilind piraniya Elbaniyan kirin misilman, hinga li gelê Elbanî miqate bû, miletê Elbanî ew himbêz dikirin, dixwestin ew serokê wan bimîne, wan ji bin siya Osmaniyan derxîne.

Rabû Osmaniyan M.Elî Paşa anîn kirin Paşa yê Misrê, ji loma li Misrê jê re digotin «Mihemed Elî Elbanî». Kurekî wî hebû, navê wî Ibrahîm Paşa bû. Vî kurî dixwest Misrê û Sûrî bike yek û xwe –weke Selahiddîn- bike Siltanekî mezin. Ji bo vê armancê himaberî Siltanê Osmanî rabû, leşkerekî giran bi xwe re hilanî û berê xwe da Sûrî, bi mêranî qûnaxên leşkerî yên Osmaniyan xistin bin destên xwe. Lê çawa berê xwe da bakur qena here Amedê ji –warê bav û kalan- aza bike, Siltan Selîm leşkerekî mezin himberî wî kire bendav, û di devera Merc Dabiq de –bakurî Helebê- leşkerê Siltan Selîm hêzên Ibrahîm Paşa şikandin.

Ne çare, Sûrî û Misir careke din ketin bin destên Xelîfê Osmanî de, lê malbata Ibrahîm Paşa man fermandarên Misrê di bin siya siltanê Osmanî de.

Wan neviyên M.Elî Paşa navekî xweş li

Institut kurde de Paris

xwe kirin, xwestin bi wê navnîşanê xwe di ser milet re bibînin, û xwe ji navnîşana Paşa riha bikin, rabûn navnîşana xwe kirin Xudêwî. Ez bawerim ev gotin ji navê Xwedê hatiye, ango; Xwedê ew daye û tim li pişta wî ye.

Xudêwî Se`îd, di sala 1859an de, peyman bi dewletên Ewropî re danî lê belgeya kolana tengav Siwês ji Frensa re muhr kir ji bo ku derya Sor û derya Sipî bighînin hev û gemî tê re derbasbin, û bi vî hawê bazirganî li deverê xurtbibe, û Misr sûdeke mezin ji vê tengav bibîne. Ta îro abûrî û jiyana 70 Milyon Misrî bi saya bazirganiya tengav Siwês û çandiniya derdora çemê Nîlê ye.

Hêjaye mirov bibêje ku wan Xudêwiyên Kurd karekî mezin di welatê Misrê de kirin, wisa jî bi sedan Kurd ên zana û bîrewer xwe li wan digirtin; wan –Kurdan jî- çand û toreya Erebî pêşxistin, weke nivîskarê binavûdeng Mehmûd Abbas Aqqad, Mehmûd teymûr, Ayşa teymûr, Ehmed Şewqî yê ku nîşana mîrektiya helbestvanên Ereb bi milê xwe vekir; di nav hemû helbestvanên Ereb de ew bû mîrê helbestvanan, ta îro jî hîn ewe. Wisa jî

Kurdan sînema û şano li Misrê damezrandin, ji wan kesan Elî Bedirxan û Mihemed Bedirxan. Welatê Misrê bi saya Kurdan bû yekemîn di her warî de, û ta îro yekemîn e, lê Xudêwiyên Kurd û zanyarên wan, navdar û maldarên wan winda bûn, ji dîrokê derketin, kar û barê ku wan bi keda xwe ser milê xwe hildan ji xelkê re man, ew û neviyên xwe li paş man, ta îro bê rûmet û rol in.

Institut kurde de Paris

# *Rewşa Kurdan li Sûrî*

Welatê Şamê; ev nav van welatan dixwîne: Sûrî, Urdun, Filistîn û Libnan.

Li gorî dîrokê û dîrokvanan miletê Kurd ji van gelên kevnar maye: Kaşî, Xeldî, Kurdohî, Oratî, Mîtanî, Hûrî, Sîtî, Neyrî, Mîdî û Sasanî; ev gelên ku bav û bapîrên Kurdane, li çiyayên Zagros, Toros –Entî Toros-, çiyayên Hekarê, Cûdî, Sîpan, û Ararat û çiyayê Bîngolê jiyana xwe dibûrandin, belê hinek ji wan gelan dirêjî deştên Şehrezûr, Mûş, Farqîn, Reha û Mêrdînê dibûn; jiyana xwe li wir dibûrandin. Vaye îro Girê Mozan, û Girê Helef hatine kolan û ji bermayên wanî giran dixuye ku ev herdû girên di deşta Reha û Mêrdînê de paytextên dewleta Kurd a Hûrî –Mîtanî bûn. Wisa dixuye ku Kurd ji berya çar hezar sal li Sûrî hebûn, wisa jî fermandar bûn. Dibe ku

Institut kurde de Paris

Kurd ên di vê demê de jî bermayên ewên kevnar bin. Lê bê gomane, dema Eyûbiyan, Selahiddîn gelek hêz û malbatên Kurdan anîne vê deverê, ew ji xwe re kirine piştgir, dûv re dema Osmaniyan jî gelek Kurd hatin Şamê û gundên dora wê ta sînorê Filistînê girtin, hatin Helebê û derdora wê, hatin Latiqiyê û derdora wê, ji xwe bajarê Hemayê payte 'ta Melek Isma'îlê Eyûbî bû, bi hezaran malbat û lehengên Kurd xwe lê digirtin, li bajarê Hemayê û derdora wî cîwar girtin. Wisa jî melek Şêrgo fermandarê bajarê Himsê bû, Kurdan li dora Himsê jî gelek deverên bi xêr û bêr girtin. Ta îro Kurd di van deveran de hene, lê piraniya wan bûne Ereb, yan jî zimanê dê û bavan jibîr kirine.

Belê hêjaye ku mirov bibêje ku îro –di vê demê de– hinek ji wan Kurd ên ku bi zimanê Erebî dipeyivin navên kurdî li zarokên xwe dikin û bi dengekî bilind dibêjin: Em Kurd in, bi taybetî Kurdên li Dêrê û Meyadînê û

Institut kurde de Paris

Reqayê, Kurdên li parêzgeha Idlibê weke malbata Bermeda û Henano û Kîxya, wisa jî Kurdên çiyayê Kurda, ew beşê bakurî çiyayê Elewiya weke gundê Qestelê û Selma û Diwêrê û hinek ji bajarkokê Hefê yê nêzî keleha Selahedîn, û ji xwe Kurdên parêzgeha Hemayê li bajar û derdora wî weke êla Berazan û Osmano, li parêzgeha Himsê jî Kurd hene ew jî li Telkelex û Quser û Sixnê û hindirê bajêrin, wisa jî Kurd li bajarê Şamê pirin, taxa kurda binav û denge, wisa jî Kurd li Zebedanî hene û li Qinêtra û Der`aa jî hene. Giringe em bêjin Kurd li hemî parêzgehên Sûrî hene bilî Swêda û Tertûs.

Vêca em dê ji xwe bipirsin: Kurdan li Sûrî çi kirine? Û çima yekemînin?.

Berya berê, Kurdan di Sûrî de Impratoriyek avakiribûn, jê re digotin Impratoriya Hûrî-Mîtanî. Wan Kurdan –yên bi navê Hûrî-Mîtanî- gelek karên çandiniyê û bazirganiyê pêkanîn. Her dem Sûrî ji



Institut kurde de Paris

cerdên Fir`ewnê Misrê, û ji cerdên Hitiyan "Hîtî" di parastin. Dûv re çaxa Selahiddînê kurdî ji Misrê hate Sûrî, bajarê Şamê kire paytexta xwe, û paytexta Impratoriya Eyûbiyên Kurd. Wisa jî Eyûbiyên Kurd, Şam kirin cîwarê zanistên misilmanan; gelek dibistanên xwendina olî ava kirin, gelek nexweşxane û xanên bazirganî ava kirin.

Kurdan peyrewê Fatimî hilanîn û peyrew Ebbas li şûndê danîn. Kurdan paytexta Xîlafeta islamê ji Qahîrê anî Bexda.

Kurdan Sûrî ya mezin (Libnan, Urdun, Sûrî û Filistîn) ji destên Xaçparêzan derxistin, ew riha kirin.

Kurdan, bi dehan, kelehên Sûrî nû kirin; bedenên ketî û herifî ava kirin, hinek keleh bi dest û zendên xwe ava kirin, weke: Keleha Selahiddîn (nêzî bajarê Ladiqiyê ye), taîro berçav e. Di dema fermandariya Kurd ên Eyûbî de, Sûrî ketibû pileya herî pêşketî de di warê avahiyê, xwendinê û abûriyê de; bajarê Şamê ketibû pêşiya Qahîre û Bexdê



Institut kurde de Paris

de.

Kurd, demeke dirêj li Sûrî, bê deng mabûn; ji sala 1270ê ve, yan li wê dorê, ji ber ku êlên Tirkan ên hov, weke Holako, Cengîz Xan, Tîmor ling û û neviyên wan, devera Rojhilata navîn ji hev xistin, li paş xistin; ala wan şûr bû, xameya wan rim bû, lê Kurd ji cihên xwe ne liviyan; warê bav û kalan bernedan, tevî ku bi sedê caran talan bûn, gund û bajarên wan wêran bûn, lê careke din vegeriyan ava kirin, û qada xwe parastin.

Piştî şerê giran û yekemîn sala 1914an derbas bû, careke din Ewropiyan çavên xwe berdan xêr û bêrên Rojhilata navîn, bihna petrolê kete pozê wan. Di sala 1917an, piştî Inglîz û Frensî bi serketin, li hev rûniştin û welatên Ereban li hev par kirin: Sûrî, Libnan û Cezair bûn para Frensa. Misir, Iraq û Urdun bûn para Ingiltera. Di wê xirepişê de, di wê tevger û talanê de, Cihûyan doza Filistînê kirin, û di peymana



Institut kurde de Paris

1917an de ya bi navê Belfor Filistîn jî dane Cihûyan, û Kurd ên koleyên ola islamê bê par man; mane pêwan û qirdiyanên dergehên mizgeftan.

Inglîzan para xwe dagir kirin, bi hesanî Misr û Urdun girtin, lê çaxa çûn ku Iraqê bistînin, û bixin bin destên xwe, Kurd ên oldar û hov li hember wan rawestîn, lê Inglîzan ew bê rûmet kirin, û soz dan ku tola "Rîçard dilê şêr" ji Kurdan bistînin, serhildan û şoreşên wan beravêtî bikin û biherifînin, û bi rastî jî soza xwe birin serî.

Çaxa ku Frensa xwest para xwe dagir bike, bi hesanî Libnan ket bindestê wê, wisa jî deverên din. Lê dema ku leşker û hêzên xwe karkirin, ceneral Goro kirin lîderê vî leşkerê mezin. Goro ji Libnanê derket û berê xwe da Sûrî. Wê çaxê Feysel Qiralê (melekê) Sûrî bû. Ma gelo wê kî berevaniyê di ber xaka Sûrî de bike? Wê kî himber hêz û leşkerê Frensa yê giran raweste? Ma kî bilî Kurdan heye?



Institut kurde de Paris

Di wê demê de melek Feysel mezinê Sûrî bû. Leşkerekî biçûk –hindik û çekên wî kevn- li Sûrî hebû, serokê wî leşkerî jî xortekî Kurd bû navê wî Yûsif el Ezmê bû – ew jî neviyê Yûsif Selahiddîn bû-, payedar û bi nîşanên bilind bû, melek ew danîbû şalyarê ceng û berevaniyê. Rabû lîderê hêja Yûsif leşkerê xwe civand ferman ji melek Feysel stand, çû, li herêma bi navê Meyselûn, kete pêşiya leşkerê ceneral Gor Herdû leşker pev ariyan, şerekî giran di navbera wan de li dar ket, xwîn rijiya. Mixabin leşkerê Sûrî şikest û lehengê Kurd; lîderê hêja Yûsif Şehîd ket, canê xwe ji xaka Sûrî re kir qurban û gorî.

Bi rastî, dewleta Sûrî piştî aza bû, navê wî di dîroka Sûrî de nivîsandin, ew xelat kirin û navê wî danîn yekemîn pakrewan û mîrekê pakrewanan.

Kurd herdem yekemîn û mîrekin lê ji xelkê re, ji bêbextan re, ne ji xwe û nijadê xwe re.

Institut kurde de Paris

Piştî ku Frensa Sûrî dagir kir, leşkerê Frensî derbasî Şamê –paytexta Sûrî- bû. Kurd ên Şamê –yên li frensiyan bi kîn bûn- nedihiştin yek leşkerê frensî derbasî tara Kurdan bibe. Kurd ên Helebê û derdora wê – bi taybetî yên çiyayê Zawiyê- bi lez rabûn, bi lîderiya Ibrahîm Axa Henano, şerek li dar xistin, armanc û daxwaza wan ew bû ku leşkerê frensî bişkînin û wan ji Sûrî derînin.

Dîroknivîsên Ereb nivîsîne, gotine: Yekemîn fîşek peqiya û yekemîn gule çû leşkerê frensawî, ya xortekî Kurd ji Efrînê bû, navê wî xortî Miho Şaşo bû.

Kurdan karekî bê hedan ji bo azadiya Sûrî kirin, dagirkerê Frensî dixwest Kurdan bi ser xwe de bîne. Serxwebûn û rizgariya miletê wan li ber guhên wan xist, lê mixabin Kurdan her û her misilmantî di ser kurdayetiyê re digirtin û digotin em îxanetê bi "birayên xwe"; Erebên misilman re nakin.

Frensa neçare komara Sûrî ava kir, û yekemîn serokê komarê yekî Kurd danî,

Institut kurde de Paris

navê wî Mihemed E`lî A`bid bû, ew di sala 1932an de bû.Pêwist em zaninin ku ew kesê tekoser ew kurdê leheng Ahmed Baravî yekemîn Ala sûrî li Şamê hilda roja ku Surya rizgar bû sala 1946 wisa jî kurdekî qehreman navê wî Ebdulkerîm Etrîs bû Ala libnanê li Beyruutê hilda ew jî roja rizgariya libnan sala 1946.

Ta îro navê serokê komara pêşî ê yekemîn, di dîroka Sûrî de, di keviran de kolayî ye. Vêca û sed carî vêca, ka em li Sûrî di nav Ereban de, em çi ne? Em kî ne? Çi rûmet ji me re heye? Bi kîjan çavî li me dinerin? Bi çavê dostan, yan bi yê dijminan? Ma gelo em hîn yekemîn in yan li pileya dawî mayî ne? Ma gelo kar û xebata me ji Ereban re kiriye -û em hîn jî dikin- bi sûde ye, yan ew kar û xebata me di ber islamê û Ereban de pûç û vala ye? Gelo piçek ji mejiyê wan, nijadperestiya wan guhertiye? Mixabin û sed mixabin, ta îro me xwe nas ne kiriye, em kolê ola islamê ne û dergevyanên dergehên

Ereban e; ew serdestî me ne, û em bindestî wanin, bi sedan yasayên ewarte û finasên genî ji me re amade dikin.

Institut kurde de Paris

# *Kurd û olperestiyê*

Miletê Kurd û Faris û hinek ji Efganan yekemîn gelin ji berya berê de di hêrikên Îranê de dijiyan. Ji berya pênc hezar sal ve û ta roja îro gelek caran navê van miletan di dîrokê de hatiye guhertin, wek: Gelên Zagros, Pars, Part Gelên Hindû Ewropî. Dûv re gelek şax ji van miletan derketin, weke Kaşî, Îlam, Sîtî, Xeldî, Hûrî, Mîtanî, Neyrî, Mîdî, Sasanî.. Di dema nû de ji hev cuda bûne; Kurd û Faris bûne du gelên cuda û tîvel, bi zimanê xwe, bi axa xwe, lê bi rastî zimanê herdû gelan nêzî heve, wisa jî ola herdû gelan yeke; misilman in; hin Şîî ne û hin Sinnî ne, û hinek hindik ji herdiwan êzîdî ne, û Mezdî û Zeredeştî pir hindik di nav wan de mane. Çend êlên Kurdan ta îro mane fileh, weke Xerzan, Bişêriyan, Sasoniyan û Silîvaniyan. Hinik Cihû jî di nav herdû gelan de mabûn lê piştî ku dewleta Israêl ava bû, ew ji

Institut kurde de Paris

Kurdistan û Faristanê derkertin û berê xwe dan Israêl cih û warê ku Xwedê soz daye wan ku wan vegerîne.

Çaxa ku yek li dîrokê vedigere û baş li ser disekine, dikare bibêje -û bê erênayê binivîse- Kurd û Faris bi nav bike: miletên sed ol. Çikû ji dema Someriyan de (herî 5000 sal) ol di nav Kurdan de dizên, yan şîn dibin, weke nimûne: Mitraî, Mezdî, Zeredeştî -ya ku ew ola sereke bû di nav Kurd û Farisan de-, Manewî, Mezdekî, Êzîdî, Dirzî, Isma'îlî, Şebek û Elî-îlahî...

Lê birastî, ola herî kevnar di nav Kurdan de Mitraî bû, olên Mezdî û Zeredeştî jê veketin û hemû şaxên ku navên wan derbas bûn ji van veketin. Piştî ola Islamê hat deverê, piraniya Kurdan bûn misilman. Belê ji ber sitemkariya "*Xilafeta Emewiyan*" û Erebperestiya wan, Kurd bûne hevalê Elî û malbata wî. Wisa ola islamê perçe kirin, gelek şaxên tîvel ji islamê veqetandi, weke: Sabîe yên ku hîn li bajarê Heranê peyda dibe, û Elî-îlahî yê ku li Ezerbîcanê û Mendelê peyda dibe.

Bi rastî, gelek olên kevnar li deverê îro winda bûne, weke: Rojperestî, Heyvperestî,

Institut kurde de Paris

Stêrperestî, Agirperestî, û ji bilî wan jî Mitraî "Misraî", Zeredeştî, Manewî, Mezdekî, û Deysanî, ev jî winda bûne.

Di baweriya min de, heger em bixwazin çîroka Kurdan û olperestiyê ji hev re bixwînin û şirove bikin, divê em hinekî li ser dîroka Sasaniyan rawestin; ango: Sasanî kî ne? Çend salan fermandarî li Îran û Tûranê kirin? Ola wan û Impiratoriya wan çi bû? Çima şikestin? Sasanî kî ne û ji kû ne?

Bi rastî, Kurd û Faris di dema fermandariya Sasamiyan de ji hev cuda bûn, û hate nasîn ku Farisan xwe di ser Kurdan re didîtin. Ji lewra çaxa Erdeşêrê yekemîn taca Îran û Tûranê li ser serê xwe danî, Erdewan –melekê Farisan- nameyek jê re şand, di wê nameyê de got: Ey Kurdo! Kê ji te re hiştiye û bexişandiye ku tu taca Îranê deynî ser serê xwe?!

Ji vê gotinê tê nasîn ku Farisan –berya Sasaniyan- fermandarî li deverê dikirin, û Kurd ji Farisan cuda ne dibûn. Dîrokvanin dibêjin ku Babik kurê Sasan, olperestekî zeredeştî bû, qerdiyanê tifka agirê pîroz ya li bajarê Estexrê bû. Kurekî Babik hebû, payebilind bû, guh li olperestiyê ne dikir,

çavê xwe berdabû nîşanek û pileyek bilind, navê wî kurî Erdeşîr bû. Erdeşîr sala 226 ê zayînê serhildanek li dar xist, û tê de bi ser ket û li bajarê Medain (Teysefûn) –nêzî Bexda îro- xwe kire qiral (Melek, şah), taca Îranî li ser serê xwe danî, himber melek Erdewan rawestiya; ew melekê ku xwe didît dûndê Eşkaniyan, xwe didît ku ew xwediyê Taca Îranê ye. Wê çaxê –weke ku me gotmelek Erdewan nameyek bi şandekî xwe re jê re şand, tê de nivîsî bi zirt û fort jê re got: Ey Kurdo! Kê ji te re bexişandiye ku tu taca Îranê li ser serê xwe deynî?! Lê bi mêranî Erdeşîr taca Îran û Tûran parast û ji xwe re digot: Bi vê taca serê min, kes tune himberê min.

Erdeşîr guh neda nameya Erdewan û mineta wî avêt. Şerek mezin û xwîndar di navbera hêzên Erdewan û Erdeşîr de li dar ket. Bi qehremanî Erdeşîr bi serket. Erdewan kuşt, û pişt re welatê Îranê û deverên bindestî Erdewan hemû rûxandin, xistin bin destê xwe. Dîrokvan gelek dibêjin: Erdeşîr keça Erdewan –yan jî ya birayê wîmelek kir û ji wê çaxê de Erdeşîrê Sasanî yê Kurd bû Impiratorê Îran û Tûranê, û ola

Zeredeşt kire ola taybet û sereke ji Impiratoriya xwe re. Erdeşîr gavek bêyî mûbed mûbedên Zeredeştiyan ne davêt.

Dîrokvan dibêjin: Demekê Kurdên Amed, Reha, Farqîn û Heskîfê ola Zeredeşt berdan û bûne fileh (Mesîhî). Nûçeyên vê guhertin û olberdanê gihan mûbedên Zeredeştî. Rabû ciwamêran civînek mezin li dar xistin. Biryar dan ku ew û Erdeşîr bi hêzeke giran herin van Kurdan ji ola felehiyê vegerînin ser ola bav û kalan; ola Zeredeşt.

Weke ku me got: Erdeşîr gavek bêyî mûbed û zanyarên ola Zeredeşt ne davêt. Erdeşîr rabû hêzeke mezin amade kir, mûbedên Zeredeştî bi xwe re birin û çûne welatê Kurdan. Dîrokvan dibêjin: erdeşîr bi xwe nedixwest miletê xwe bi darê zorê vegerîne, wî bi xwe rûmeta ola Mesîh digirt. Vêca wê demê bi pend û şîretên mûbedan piraniya Kurd ên deverê vegeriyan tifkên agirê pîroz ava kirin û ji nû ve dadan, lê hinek ji Kurd ên Farqîn û Heskîfê û derdora wan ola Îsa (felehiyê), bernedan û ta roja îro feleh in; zar û zimanê wan Kurdiye, ew bi Ermenî û Siryanî nizanin. Zimanê wan Kurd ên feleh ji yê Kurd ên misilman zelaltir û

Institut kurde de Paris

paqijtire, çiku gotinên Erebî yên Qur`anê ne ketine zimanê wan. Ji van Kurd ên ku ta îro feleh in: Kurd ên Sasonê, Bişêriyê, Farqînê, Reman, Dekşûrî û hevêrkî.

Em dizanin ku melekên Kurdan ên Sasanî ji sala 224an ta 636an de ango 412 salan fermandarî kirin. Wisa jî zanyar û mûbedên Zerdeştî desthilat bûn, biryara şer û xêrxwaziyê di destên wan de bû. Vêca çawa ev Impiratoriya Kurdên Sasanî ya na dar, tevlî ola xwe ya kevnar, bi lez herifî? Ereb bên çola yên birçî û tazî ew şikandin, zîv û zêr, keç û jinên wan talan kirin? Eywan û qûnaxên Restemê Zalê û Kisra dagir kirin? Ma gelo çima van qehremanan, van oldarên Zeredeştî dest hilnedan û bi lez xwe radestî Ereban kirin?

Dîrokvan dibêjin: Sedema kuştina lîderê mezin û bi nav û deng Restem, di dema melekê Sasanî yê dawî de Yezdekurd ê pênca ev bû:

1) Yezdekurd û Restem bawer nekirin ku Erebên bindestî wan bi hêz bûne, xurt bûne, û ne hemberî leşkerê wan in; ne hemberî vî leşker ê bi rêk û pêk û bi sîstem hatiye damezrandin.

Institut kurde de Paris

2) Qiralê Sasanî û Restem ê Zalê di nav pêlên xweşî û şahiyê de noq bûbûn, leşkerê wan bê rûmet, bê pergal û rêxistin mabû, weke pezê şivan razayî.
3) Oldarên Zeredeştiyan gelek bac ji milet didan hev, loma melekê Sasanî pişta mûbed û oldarên mezin digirt, her tişt ji wan re bexşane bû.
4) Dijminên Sasaniyan pir bûbûn, çi li derve û çi li hundir. Ji wan dijminan bermayên mîrekên Faris û Romanan bûn, wisa jî oldarên feleh û cihû û manewî û mezdekî hemiyan dijî ola Zerdeştî kar dikirin.

Lê sedem çi be? Sasanî çima şikestin? Çima leşkerên Ereban biserketin? Çima ola misilmantiyê bi lez di nav Kurdan de belav bû?. Ez dikarim nerîna xwe bi kurtî bibêjim.

Kurd miletekî sinc serte, hiş û ramanên vî gelî bi asîmanan ve, bi tirs û sawa dêw û teban ve girêdayî ye, ev gel zû germ dibe û zû sar dibe. Wisa jî di dema Sasaniyan de weke dema îro gelê Kurd bûbû dilkiriyê olên rengîn û cûrecûr. Kurdan desthilanîn û berxwedan jibîr kiribûn, fermandarî û serokatî ji hişê wan derketibû. Vaye îro –

Institut kurde de Paris

weke nimûne- tu ji kurdekî re bibêjî: Tu Kurdî tu berya berê xwedî tac û Eywan bû, tu lîder û desthilat bû, ma gelo Kurdo! Te serfirasî û dewlet divê, te azadî û fermandarî divê, yan jî te misilmantî divê? Ji sedî not wê Kurdo bibêje: min dîn û îman divê!!

Pêwîste ez di vê mijarê de dabaşa cihûyên Kurdistanê bînim zimên û hinekî bi kurtî di biwara hatina ola Cihûyan –yan jî Cihûtiyê- û derbasbûna vê olê û hatina wan welat û deverên Kurdan de.

Di dîrokê de beyane ku cihûtî ola pêxember Mûsa ye. Warê vî pêxemberî Misir Sîna û Filistîn bû. herweha, her kes dizane ku pêxember Mûsa li ser qoqê çiyayê Sîna bi Xwedê re peyiviye, lê ev ola dûrî Kurdistanê çawa derbas bû? Kê jê re kar kiriye ku hinek ji miletê me baweriyê pê bînin? Bersiva vê pirsê –di baweriya min de- eve:

I`braniyan bawerî bi ola Mûsa anîn û herdem dixwestin ku ji bin destê Babiliyan derkevin. Impiratoriya Babiliyan pir xurt bûbû, dijberê derdora xwe hemû dirûxandin, serhildanên gelên bindestî xwe diperçiqandin. Di wê demê de I`braniyên cihû pir serêşî ji Babiliyan re çêdikirin;

dixwestin xwe aza bikin. Ji bo vê yekê Sargonê Babilî di sala 721ê B.Z hêzeke mezin karkir û çû Filistînê, serhildana cihûyan perçiqand û gelek cihû û serokên wan bi xwe re anîn Babil, ew talan kirin, ew li welat û çiyayên Kurdan belav kirin. Ew talan û koçberî jê re dibêjin koçkirina yekemîn a Cuhûwan.

Cara dudiwan melekê Babil Neboxeznesir di sala 538 ê B.Z gelek cihû û serokên wan koçber kirin; ew ji Filistîn derxistin û avêtin welatê Farisan û Kurdistanê û ji vê koçberiyê re dibêjin: talan û koçberiya cihûyan a dudiwan.

Helbet ew cihûyên ku li dever û warê Kurdan bi cih û war bûn xebat kirin, û gelek ji Kurd û Farisan kirin cihû, û ola cihûtiyê li deverê belav bû. bi zîrekî û keysebazî xwe ji oldarên Zeredeştî diparastin, ne weke felehan ên ku dixwestin Kurd û Farisan bibin ser ola Mesîh. Ji bo wilo Zeredeştiyan -bi alîkariya serokên xwe- ew feleh talan dikirin û dikuştin.

Dîrok dibêje: Piraniya cihûyên di bin siya fermandariya melek Koreş (Goreş = çiyayê reş) di sala 534 B.Z de vegeriyan Filistînê.

Institut kurde de Paris

Dibêjin ku ew Goreş nijadê wî Mîdî bû, ne ji şaxê Parisan bû, wisa jî diçesipînin ku Goreş bawerî bi ola Mûsa (cihûtiyê) anîbû, ji loma cihû aza kirin.

Xuyaye cihûyên ji nijadê Ibraniyan vegeriyan Filistînê lê Kurd û Farisên ku bûne cihû li ser axa xwe man, welatê xwe bernedan. Balkêşe ku ta vê dema nêzîk cihû li Kurdistanê hebûn, bi taybetî li bajarên Zaxo, Hewlêr, Agirê, Silêmanî, Nisêbîn û Qamişlo. Lê dewleta cihûyan ya bi navê Israêl, cihûyên Kurd handêr kirin ku ew jî herin welatê wan, û di salên pêncî û bi şûnde cihûyên Kurdistanê hemû çûne Israêl, û ta roja îro dibêjin Em Kurd in. Civat û rêxistinên wan hene, cejna Newrozê û ahengan li dar dixin, kinc û cilên Kurdî yê folklorî werdigrin, neçare, nû hînî zimanê Ibrî bûne.

Li gor hevpeyvînekê bi serokê komîta cihûyên Kurd re li bajarê Stenbolê, wî gotiye: Em cihûyên Kurd li Israêl sed û pêncî hezar hene û gelek zanyar û lîderên bi nav û deng ji me hene.

Ev bû çîroka Kurdan û her çar olên sereke; Zeredeştî, cihûtî, mesîhî (felehî) û

Institut kurde de Paris

misilmantiyê. Pêwîste em dabaşa şaxên van olên çûyî bînin zimên, wisa jî em navê riyên sofîtiyêdi nav Kurdan de ji we re bibêjin. Şaxên olên sereke ola islamê di nav Kurdan de evin: Elewî, Elî îlahî, şî`e, Xaricî, Selmanî, Şebek, Sabîe û Ehlilheq.

Riyê sofîtiyê û şêx û ewliya jî evin: Neqişbendî, Qadirî, Nûrisî. Begdaşî, Zîlanî, Xeznewî, Mewlewî, Qederî û Wehabî.

Herweha rêbazên islama Sinne jî evin: Şafi`î, Henefî, Malikî û Henbelî.

Institut kurde de Paris

# *Çend caran em hatine xapandin*

\- 1 -

Min di dabaşa Ebû Mislim ê Xerasanî de aniyê zimên, lê pêwiste ez vê babetê careke din bênim zimên.

Ebû Mislim ê Xerasanî lehengekî Kurdî bû, mêrxasiya wî bê pîvan bû.

Vî qehremanî perwayê Emewî yê dawî Merwan bin Mihemed yê ku diya wî Kurd bû, ev perwayê Emewî hilanî û perwayê Abbasî li şûna wî danî. Perwayê Abbasî Ebû Ce`fer el Mensûr Ebû Mislim di dîwana xwe de kuşt. Berî wî bikuje Ebû Mislim jê re got : Min ji dijminên xwe re bihêle! Ebû Ce`fer lê vegerand: Ma gelo dijminên min ji te dijwartir hene?.

Ev bû xelat û qenciya Ebû Mislim ê Xerasanî (Iskenderê Sanî: Iskenderê didiwan). Heware Kurdino – Merdino hûn dê Ecêba bi çavê serê xwe bibînin.

Institut kurde de Paris

## - 2 -

Di cenga Çaldêran de 1514 yê zayînê, leşkerê Osmaniyan Kurd bûn, wisa jî leşkerê sefewiyan. Di wî şerî de bi hezaran xortên çeleng û lehengên gewre ji miletê Kurd hatin kuştin; ango Sultanê Osmanî û Şahê Sefewî serê Kurdan li hev dixistin û dawî Kurdên Turkiya serê Kurdên Îranê pelixandin û sultan Selîm ê Osmanî bi serket û pozê şahê Îranê şikand û sînorê xwe li gor xurtiya xwe danî û çesipand, lê belê ka bibêje me Kurdan çi sûde ji ancama wî şerê girew dît?.

Sultan Selîm berê leşkerê xwe yê biserketî da Sûrî û Misrê, di şerê Merc Dabiq li Sûrî û şerê Rêdaniyê li Misrê dijminê xwe qûn rim kirin, bi hesanî Sûrî û Misir jî xistin bin destê xwe, gelek mizgeft û olxane li bajarên Helebê, Hims û Hema û Şamê ava kirin û gelek ji serokên Kurd li wir hiştin; ew danîn pêwanên wan mizgeftan, bi vî hawayî perda Islamê ya reş avête ser çavê wan Kurdên dilsoz, nexasim sultanên ku dûv wî re Şam

Institut kurde de Paris

a "şerîf" ew dikirin rêberên karwanê wan kesên ku diçûn mala Xwedê ji ber ku wan deman Durzî diketin riya wan karwanan ew dişelandin. Ev bûn xelat û qenciyên Sultanên ola Islamê ji Kurdên dilpak re.

Sefewiyên Iranê ji Kurdan re gotin : We di şer de kuramên xwe nedikuştin, bi vê sedemê em di şer de şikestin, Kurd tewanbar kirin bi sedan gergerên Kurdan kuştin, rez û pezên wan talan kirin, nîşanên gelek lîderên Kurd ji ser mîlê wan rakirin, ta îro ev Îraniyên hov şerê miletê me dikin.

Hûn hemû dizanin ku namûsa xwe, axa xwe, û petrola xwe xistin bin destê Stalîn ji bo ku Stalîn leşkerê sor ji Îranê bikişîne, hûn xweş bîr dibin çawa wan rîhşemaran komara Mehabadê beravêtî kirin, ta îro keçên me yên kezîzer li sêdarê dixin ev karê ku di dîroka mirovantiyê de nebûye û kesekî nebihîstiye.



Institut kurde de Paris

## - 3 -

Di sala 1922 de Mustefa Kemal cibeyê şêxan û kofî û keska wan wergirt li Kurdistana bakur geriya, ji şêx û melan, axa û beglerem re got: Gelî islamperweran, gelî sêwîyên Islamê ma hûn nabînin û na bihîzin?

Van Sultanên ola Islamê yên li Istanbolê rûnîşt Xan û Malên xwe kirine kerxane û meyxane, Destûra Islamê xistine bin piyên xwe, heware rabin, bi min re alîkar bin, divê em wan bavêjîn, wan ji qurm de rakin, em Islamek rast bînin hole. Carek din Kurd hatin xapandin û bûne hevalbendên Etaturk perwayê Osmanî xistin, lê mixabin û sed mixabin wî şofînizmê Turk piştî li ser sendelê komara Turkî rûnişt destê xwe li serê şex û axayên Kurdan peland ew koçeber kirin, ew kûştin, kum û kolos li wan qedexe kirin, û dawî şêxê şêxan Seîdê Palo û hevalên wî li Amedê li sêdarê xistin.

Institut Kurde de Paris

## - 4 -

Barzaniyê nemir ji Rûsya vegeriya, ji serokê Iraqê Ebdulkerîm Qasim xwest ku mafê Kurdan yê Siyasî û çandî bide wan, lê serokê serhişk li serê xwe siwar bû, li sozên xwe poşman bû, ji Barzanî re got: Besî teye min tu bexişandiye, min hiştiye tu vegerî welêt. Barzanî gelekî hewlda û xebitî ji bo bê şer û kuştin mafê Kurdan ji hukûmeta Iraqê bistîne, lê Qasim û taximê xwe ev daxwazên Barzanî qedexe kirin, dawî jî di nav xwe de biryar dan ku Barzanî bikujin.

Neçar Barzanî û tekoşerên Kurdan berê xwe dane çiyayê pozbilind; warê bav û kalan û şoreşa 1961ê li darxistin. Helbet şoreş bê alîkarî û hevalbendî bi rê nakevin û berdewem nakin, Kurdan alîkarî ji Rûsan xwestin, lê Rûsan pişta xwe dane wan. Rabûn gihan dijminê bê soz; şahê Iranê, pazde salan pêşmergên cangorî şerê hêzên Iraqê kirin, ta ku serokê Iraqê Sedam Hisên di Avdara sala 1975 de li bajarê Cezair

Institut kurde de Paris

peymamek bi şahê Iranê re muhrkir û Erebistan kire qurban li ber lingê şahê Iranê serjêkir û careke din Kurd hatin xapandin şahê Iranê alîkarî ji ser şoreşê birî. Barzaniyê hêja nehişt mîletê wî û pêşmergên wî li ber lingan herin piraniya wan bêne kuştin, ew parastin bi zanebûn şoreş rawestand.

Institut kurde de Paris

# *Xumeynî*

Sala 1979 Xumeynî ji Kurdên Iranê xwest ku alîkariya wî bikin û ji bo şoreşa wî bi serkefe Xumeynî ji Kurdan re digot: Em û hûn ji yek nijadî ne, em birayên hevin di regez û olê de, ji wan re digot: Ev şahê Behlewî hat û petrola Iranê dixe devê gawiran, kernevalan di cejna Nûrozê de çêdike bi milyarên dolaran dirijîne, keç û xortên Islamê hînî her vexwarin û vexwarina qedexe û heram dike, ji Kurdan re got: Heger şoreşa min a Islamî biserkefe ez dê mafê miletê Kurd yê siyasî û çandî û cuxrafî bidime we, û hûn dê pişikdarê welatê Iranê bin; wî ava bikin. û gelek soz dane Kurdan. Himber van sozên Xumeynî şêx û mela, beg û axayên Kurdên Iranê bi xurtî beşdarî di şoreşa Xumeynî de kirin, lê pîştî şoreş biserket û Xumeynî li ser Erşê Iranê rûnişt, Kurdan buhayê ked û xebata xwe kirin buhayê xwîna pakrewanên xwe di şoreşê de xwestin. Xumeynî daxwaza Kurdan xiste bin lingê xwe û got: Ev dewlet a Islamê ye, ne ya mileta ye, tenê hûn

Institut kurde de Paris

dikarin doza avakirina mizgeftan bikin. Xumeynî Kurd xapandin û ji wan re got: Hûn kurê şeytanê mezin in.

Institut kurde de Paris

## *pirtûkên nivîskar ên çapkirî*

1-Gula civatê – çîrok, 1995.
2- Çîvanok û pêkenok – 1996.
3- Xelata Mandêla – Helbest, 1999.
4- Em beranên ber kêrê ne. –çîrok, 2000.
5- Stêr û bêr –çîrokên pendan, 2000.
6- Fêrbûna zimanê kurdî, 2005.
7- Çend goşî ji mêwa jiyana min- helbest, 2006.
8- Ferhenga dengan- 2009.

## *pirtûkên destnivîs*

- Derya rewrewkan.
- Alfabeya ciwanan.
- Pend û metelok. 4 cild.
- Kurtejiyana min.

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris



Xwendevanê hêja! Hûn dipirsin ez kî me ?

Ez kurê Kaşî û Kûtiya me; ewên ku cerdên Babiliyan ji ser çiyayên xwe vedigerandin.

Ez torinê Hûrî- Mîtaniya me; ewên ku cerd û artêşên Fir`ewnên Misrê dişikandin.

Ez kur-amê Mîdiya me; ew qehremanên ku Impiratoriya Aşûriyan herifandin.

Ez pismamê Yûsif (Selahiddîn)im; ewê ku islam ji Çalê derxist, lê mixabin, misilmanan welatê wî li hev par kirin, ew xapandin.

Ez hizyarê serokê hêja Barzanî me; ewê ku Hêzên Seddamê hov dirûxandin.

Ewê ku lingerên welatekî aza ji me re çandin.

Institut kurde de Paris